


# ROJANÛ

*kovara huneri çandi û edebi*

HELEPÇE 1988



5000 KUŞTÎ 7000 BRÛNDAR

20  
1988

## NAVEROK

Helbest . . . . .	3
8'ê Adarê . . . . .	4
"Hûn nîkarm Kurdi qedexe bîkî" . . . . .	7
Helbest-"Ez ım Kurdistan" . . . . .	9
Folkloristika Kurdi ya Muziki û Problemên Wê	
Nûra CEWARÎ . . . . .	10
Bî Kerim Hama ARIF ra hevpeyvîn . . . . .	14
Zımanê Standard-Tomy OTTERBRAND . . . . .	16
Hunermendê Şoreşger Arif SEVİNÇ . . . . .	18
Hiroşimayeke Nû: HELEBÇE . . . . .	20
NEWROZ . . . . .	22
Piyes— Kincên Sporê yê Sê-reng . . . . .	24
Listika Çevgan, Evliya ÇELEBÎ . . . . .	27
Jî Nav Edebiyata Cihanê: G.G. Marques . . . . .	28
Bî Aramê TÎGRAN ra Hevpeyvîn . . . . .	32
Quncikê Zarokan . . . . .	36
Jî Nav Weşanan . . . . .	38

Sal : 9  
Hejmar 63 Gulan 1988

XWEDÎ : KOMKAR - Swêd  
BERPIRSIYAR : Şeroyê BOTAN  
NAVNÎŞAN : Döbelngatan 16 B  
113 58 STOCKHOLM  
TELEFON : 08 / 32 82 51  
HESAP NO : PG. 458980 - 0

UTGIVARE : Svensk-Kurdiska  
Arbetar Föreningen  
ANSVARIG UTGIVARE : Ş. BOTAN  
ADRESS : Döbelngatan 16 B  
113 58 STOCKHOLM  
TELEFON : 08 / 32 82 51  
PG : 458980 - 0

# h e l b e s t

## EY NEWROZ

*Diyari ji bo Newroza 2600 salî*

*Ey newroz, ey newroz, zer û sor germ bibe  
Zwistana sar li ser Kurdan dirêj dibe  
Mîrov têne kuştin, ti û birçi herroj dîmûrin  
Agrê xwe geş bike, bila reben pêşabin!*

*Ey newroz, ey newroz tu nişana bîharê!  
Bes e berf barin, bî baran be bîbare!  
Li ser xaka Kurdistan dijmin şer dîkin!  
Kurd bê warin, bî bawerîn, Kawa dinêrin!..*

*Ey newroz, ey newroz tu mîzgîniya azadî.  
Bî te hevîne belengaz, karker û gundî.  
Hemû dîxwazî bî te destên xwe bîdî hev,  
Jî bî nîrê kolonyalîstan derkevî, azabî tev.*

*Ey newroz, ey newroz bîjî cejna Kurdistan.  
Hemû Kurd bîbî yek, emê derkevî jî bî destan.  
Kurd jî dîbî nav welat, dî nav koma netewan.  
Ey newroz, ey newroz tu li me Kurdan pîroz.*

1985 - 1988

A. BALÎ

## BAYÊ NEWROZÊ

**Bayê Newrozê  
Bakî xweş germ e  
Hêdî direve  
Seqem û serme**

**Sehera sibê  
Bayekî nermin  
Gul da evîne  
Xemgîni revîn...**

**Nêrgîz û kulîlk  
Hêdî vedîbî  
Zelal û hênîk  
Kani derdîbî!**

**Gul û şahî tê  
Çol û darîstan  
Kesk û sor û zer  
Xemla Kurdistan!**

AZAD F.

28.02.1988

## SALA TEZE

**Sala teze!  
Sala hezar nehsed û heyştê  
û heyştan  
Nêzik dîbî  
Wekî dinê, jî mîn dûr e  
Welatê mîn, Kurdistan.  
Singê te yî kal î gewr  
Hên ne deq e, ne şan.  
Erê,  
Hêvanê mirovan  
Hêy sala nû!  
Î şêrin e.  
Tal dîke rengemîrovên  
gunehkar.  
Mîna sala te a çûnî  
Zarokên Kurd,  
Li ber bombên şîmik çûnî.  
Ker bûn ku dîxwestin  
gelan bîndest bîkî  
Kertûrî ku hên dîxwazî  
berdewam bîkî.  
Sala teze!  
Sala bêguneh,  
Sala heyştê heyştan.**

## NEWROZA AKRÊ\* - 1950

**Lî destpêka buharê  
Bîst û êkê Avdarê  
Newroz e...**

**Roja azadîyê ye  
Aşti û wekhevîyê ye  
Newroz e...**

**Bêhna dar, gul û giya  
Agr e l'serê çîya  
Newroz e...**

**Çî geş bûye erdê me  
Govend e lî gundê me  
Newroz e...**

**Cîwan bûye Kurdistan  
Çîra ye l'erd û esman  
Newroz e...**

\* Akre: Bajarekî jî bajarên  
Kurdîstana Iraqê ye.

**Newroza we pîroz bît û  
her bîjî bo Kurdistanê.**

Nisan SORÇÎ

**Xezala mînê!  
Wa melezîne lê!  
Disa kelegîrî û şîne  
Lî welatê mîn, Kurdistan.  
Sala nû, kihêla mîn e  
Navê te bîkî çî?  
Henîya te nişan bîkî mî bî çî?  
Pêrçema te, mala mînê!  
Ne a şekîrîye  
Bîskên helbesta mîn  
-Mala te ye jî-  
Loma, ne a hunandî ne.  
Aska mînê,  
Mîrûzan tal meke  
ku helbest a vekîrîye.  
Bîbîhîse, bîst mîlyon Kurd  
Jî vî zimânî a bêparkîrî ne.  
Rewşa te ne xweş e.  
Va helbesta mîn jî şkest  
De wa bîxwîne:  
"Şereftîrî gelîn,  
gelên bîndest"**

AMED

Paris, 07.01.1988

# dı şerê azadiyê da jin û mêr bî hevra!

Dı sala 1910'an da lı paytextê Danmarkê lı Kopenhagê, dı konferansa Navnetewî ya Jinên Sosyalist da 8'ê Adarê wek Roja Jinên Xebatkar yê Cihanê hate qebûlkırın. Û jı wê rojê heta iro ew her sal lı çarali cihanê tê pirozkırın.



Clara Zetkin 1931. FOTO: BILD UND HEIMAT, BERLIN

Hilbijartına vê rojê wek "Roja Jinên Cihanê" bêşik tesadufî nine, maneke wê ya dirokî heye: Dı 8'ê Adarê sala 1857'an da lı Emerikayê jinên karker yê ku dı kaxanên tekstil da dixebitin, jı bo mafên xwe yê abori û jı bo ku roja xebatê bête kêmkırın, bibe 10 saet, lı New-Yorkê daxuyani çekırın û grev danin. Jinên karker gelek zordesti ditın, 129 karker hatın kuştın lê jı têkoşına xwe paşda venekışıyan.

Ev roj û berxwedana han wê dı dirokê da bîbüya nişana şerê jinan lı diji newekheviyê, kedxwariyê û zordestiyê. Dı 8'ê Adarê sala 1910'an da lı paytextê Danmarkê lı Kopenhagê Konferanseke navnetewî civiya û dı vê civinê da têkoşera tevgera karkeran Clara Zetkin pêşniyar kır ku 8'ê Adarê bibe rojeke navnetewî jı bo hemû jinên xebatkar ên cihanê. Ev pêşniyar dı civinê da hat pejrandı. Jı wê salê heta iro 8'ê Adarê wek sembola têkoşına jinên cihanê, lı diji emperyalizmê, kolonyalizmê, şovenizmê, newekhevi û zordestiyê tê pirozkırın.

Tevgera pêşverû a jinan ku bı pêşengiya têkoşerên wek Rosa Luksemburg û Clara Zetkin

destpê kır, bı wextê ra xurt bû, lı çarali cihanê belav bû.

Wek parçeki tevgera çini, tevgera jinan her dem lı ber xwe astengi û dijarıyên mezin dit. Dı şerê azadi, wekhevi û aştıyê da jinên pêşeng hatın girtın, êşkencekırın, sansurkırın û kuştın. Lê disa jı pêşî lı pêşketın û firehbûna tevgera jinan nehate girtın.

Nivê civatê jin in. Ew dı diroka mirovatıyê da her dem beşdari şerê jıyanê bûne. Bona pêşketına civatê, dı warê abori, civaki û çandi da, jinan bı cehd û xebateke aktif cihê xwe girtiye, û iro jı her ew cehd û xebata dom dıke. Lê mıxabın ku iro jı, lı gelek derên cihanê, dı civatê da yê ku bêtır tên zarandı, bêtır dı bın zordesti û kedxwariyê da diêşın jin in. Dı welatên sermayedar da, hejmara bêkaran dı nav jinan da bıldıtır e. Hê iro jı keda jinan erzan tê kırın, ew gelek caran wek maleki bazır-gani û eşyaki zewqê tên firotın.

Diroka zordestiyê lı ser jinê pır kevn e. Beri ku mirov jı jıyana şkeftan derbasi şıvani û cotkariyê bûn, angoo beri ku bûne xwediyê mal û mıl, serdesti û jêrdesti tunebû. Dı wê civata kevnare û komunal da jinê zordesti nedıdit. Dı

## Newroz Tê

Lı dnê  
Çendi çend kulilk bışkivin  
Çend çend zıvıstan çûn  
Gıhiştine bıharê  
Û çendi çend berbang çırand  
Şevên tari,  
Îro ji  
Ajdıdın gul ber bı Newroz  
Nav xwinê roj hiltê  
Lı ser Kurdistanê,  
Stêrkên soronek, nav şışên reş  
Ber deriyên heft kilit derketın  
Jı sing û çavên gırtiyan  
Pêçand dorberê taşxana Diyarbekerê,  
Pışkê xwinê lı ser hêşinayi  
Lı Hewlêr, lı çiyayê Zaxoyê  
Newroz tê,  
Newroz tê, lı suka Mahabad  
Belavok bın deriyan  
Tıving nav mılan  
Lı ser lêvên ken û rık  
Dıl lı nava destan  
Pêşmerge,  
Seranser xemilandın  
Ronahi kırım tev lı ser Kurdistan.

VAZGAL

*Kurdistan welateki zengin e. Heyiyên wê yên sererd û binerd dikare jiyaneke têr û tiji bide gelê me. Lê kolonyalîstan welatê me di nav xwe da parvekirine û wê talan dikin. Xwina gelê me yê zehmetkêş dimjin.*

*Hebûna me, ziman, çand û diroka gelê me inkar dikin. Gelê me di nav nezani û xızaniyê da dihêlin.*

*Pêwendiyên feodali, kedxwariya şêx û axan ji serbari ser. Gelê Kurd bi 20 milyon insan li ser erdê bav û kalên xwe bîndest û perişan diji. Di van hoyan da jinên Kurdistanê bêtir diêşin.*

*Foto: Ji arşiva Roja Nû*



rêvebirina komên mirovan da jinê roleke mezin dileyist. Lê paşê cihê jinê di jiyana civaki da bere bere hate guhartin. Mina ku di civata komunal da serweri kiriye, di civata koletiyê da koleyê heri erzan bûye, di sazumana feodali da endamê civatê yê pasiv û bê rûmet bûye, hatiye kirin û firotin. Hemû destûr û rêbazên civaki, hîqûqi, dini û hwd. azadiya jinê jê standine. Piştî ku sermayedari derkete ortê, cihê jinê di jiyana civaki û abori da pir hate guhartin. Angori derebegiyê di kapitalizmê da jin bêtir azad bû û hinek mafên civaki, abori û de-

mokratik bi dest xist. Lê disa ji jin rızgar nebû. Ji ber ku heta kedxwari û newekheviya çini ji navê neyê rakirin, azadiya jinê ji bi awaki durust pêknayê. Rızgariya jinê ji wek rızgariya hemû karker û zehmetkêşan di sazumana sosyalist da pêktê.

İro rewşa jinên Kurdistanê çi ye? Di vi wari da zêde tişt gotin ne hewce ye. Neheqi û zordestiya li ser jinên Kurdistanê qat qat zêde ye. Xasma piştî hatina cûnta faşist ji sala 1980 heta niha birçibûn, bihati, xızani û zulma faşizmê jiyana li mirovên zehmetkêş, karker û

gundiyan kırıye cihennem. Dı vê demê da dı cıvatê da nexweşi û xırabiyên mezın peyda bûn. Dızı, fuhûş, ruşwet û hwd. dı cıvatê da geleki belav bûye. Sedemê van hoyên xırab dewleta faşist e ku bona parastina saltanata çengek mırovên parazit, burjûvaziya monopol, bı darê zorê bı milyonan mırovên zehmetkêş dajo nav birçibûn û xızaniyê. Gelek jinên xızan, yên bê iş û kar, bedena xwe difroşın ji bo ku pari nan ji zarokên xwe ra peyda bıkın.

Lı aliyê dın Kurdistan xwedı pêwendiyên struktureke cıvaki ya niv-feodal e. Ev ji sedemeki dın e ku lı Kurdistanê jin dı hemû warên jıyanê da lı planeke paş cih dıgrın. Hin iro ji beşeki mezın ê jınan dı bınê çarşevê da nın, fırotına wan bı qelen iro ji dom dıke. Xwendın û nvisandın dı nav jinên Kurdistanê da geleki kême.

Bêşık sedemê heri mezın ên hoyên vê jıyana nebaş ew e ku welatê me koloni ye û hêzên kolonyalist welatê me lı me kırme zindan. Riya pêşketinê lı ber gelê me bırine. Hemû cureyên zulmê lı dıji gelê me bı kar tının ji bo ku koletiyê pê bıdın razıkırın. Dı bın êriş û zordestiya kolonyalistan da jin bêtır dıêşın.

Lê rastiyeke berbıçav ji heye ku ev rewş weha dom nake. Wek hemû gelên bındest gelê Kurd ji ji bo azadiya xwe şer dıke. Dı şerê azadiyê da jinên me ji bere bere xwe rêz dıkın û tevi refên azadixwazan dıbın, hım ji bo rızgariya welatê xwe hım ji wek jin ji bo rızgariya xwe şer dıkın. Ew, roj bı roj bêtır rüyê kolonyalizmê, paşverûtiyê nas dıkın. Dı gel mêran lı hember zordestiya faşist, êşkence û zul-



*Keça Kurd têkoşera qehreman Leyla QASIM dı şerê azadiya gel û welatê xwe da şehid bû (5 Gulan 1974) û navê wê iro bûye nişana xebata jin û keçên Kurdistanê ji bo azadiyê.*

ma komando bı mêrxasi berxwe dıdın. Çend meh berê lı Diyarbêkrê jınan bı greva xwebirçi hıştinê û berxwedanên dın bı cunta faşist gavên paş dan avıtın. Ev ji nımûneke berbıçav e ku jinên Kurdistanê bere bere çavên xwe lı jıyana siyasi vedıkın, ji bo şıkandına zincirên koletiyê derdıkevın meydana şer.

- Serkevtın û serfirazi ya gelê me ye.
- Jı bo Kurdistanê azad û demokratik jin û mêr bı hevra agirê azadiyê bıldın bıkın.

.....  
Metırse j'jiyan!  
Metırse j'zeman!  
Alê bıldınke!  
Serê xwe rake!  
Dakeve meydan  
Wek şêr û mêran

Ketın ji hene  
Rabûn ji hene  
İro ketın .. zor û tari ye  
Sıba rabûn e.. xaşi û şahi ye  
xaşi û şahi ye

GUNDÎ  
20.9.1982

Diyarbakır : Kela Berxwedanê

## hûn nikarin KURDÎ qedexe bikin!



Dî meha Sibatê (1988) da nêzi 2000 girtiyên siyasi li zindanên eskeri ya Diyarbakır li hember êşkence, kuştin, zîlm û qedexeyan û bî taybetî jî qedexekirina KURDÎ ketin greva xwebirçihîştinê. Berxwedana girtiyên siyasi, dî nava demekî kurt da li hemû Kurdistan, Tırkiye û Ewrûpayê belav bû.

Ewîl piştîgiriya jî girtigeha sivil ya Diyarbakır, piştî grevê girtigehên Metris, Aydın, Saxmalçılar 2, Meletye û wd. hate nişandan. Piştîgiriya herî mezîn bêşik jî alî malbatê girtiyên û du mebusên SHP 'ê hate nişandan.

Berxwedana girtiyên dî 9'ê Sibatê da destpêkî û 11 roj dom kir. Piştî 11 rojan û berxwedanek bî rîk, hukumeta Ozalê xulamok jî daxwazî û şertên girtiyên ra seri danin. Û ev berxwedana han nişan da, ku zîlm û zordari nikare li her tiştî serdestî bike; ev berxwedan nişan da, ku gel bixwaze dikare qedera gelek tiştan biguhurine û bî serkeve.

2000 girtiyên Diyarbakır jî mîrînê ra meydan xwendin û ev daxwazên jêrin pêşkêşî hukumetê û berpirsiyarên sadist yê girtigeha Diyarbakır kirin:

- Dî hevdiyan da serbestbûna axaftina KURDÎ'
- Rakirina kincên yek tip.
- Qebûlkirina statuya girtiyên siyasi.
- Dî derheqê bûyerên kuştin û êşkenceyan da lêkolîn û mehkemevekirin.

- Qedexekirina zincirkirina girtiyên.
- Dî mehkemeyan da rakirina qedexeyên ku li ser mafê xwe parastinê ne.
- Betalkirina biryarê mehkemeyên eskerî, qebûlkirina vekirina mehkemeyên nû.
- Serbestkirina rojnameyan û dan û stendinên bî wan ra.

Piştî berxwedana girtiyên siyasi yê girtigeha eskerî, dî 6'ê Nisanê da 200 girtiyên girtigeha sivil destbî greva birçibûnê kirin. Her weha ew jî, bî eynî daxwazên jorin ketin berxwedanê. Ev berxwedan 20 roj dom kir û alîkariyek mezîn jî xelkê wergirtin. Bî dehan jin û mêr dî merkeza SHP da ketin berxwedana piştîgiriyê. Xelk li ber derê girtigehê û Wali civiya û hukumetê protesto kirin. Dî vê kiriyarê da bî dehan keç û xort hatin girtin û êşkence-



*Dayikeke Kurd li Diyarbekirê xwe dîşewitine!*

kırın. Lê piştî 20 rojan daxwazên girtiyên hate qebûlkırın. Piştgirê berxwedana girtiyên ne tenê dê û bav bûn, her wisa rêvebirên SHP yê Diyarbekır, xwendevanên Universitê, Petrol-İş, Yol-İş û bî hezaran imzeyên berevkırî bûn.

Dî van herdu berxwedanên bî rûmet da, li girtigeha eskerî bî navê Emin Yavuz welatparêzek mır, gelek insan ketin halê mırinê. Lê piştî berxwedanan, daxwaziyê girtiyên hate qebûlkırın, zırt û tehdidên dagırkeran pere nekır û rezilî û nıjadperestiya wan car dın aşkera bû.

### "LI HEMBER RÛREŞIYA DEWLETÊ XWE ŞEWITANDIN"

Lê piştî têkoşin û êşandimeke mezın ya girtiyên, jî alî hukumetê va hate êlankırın ku daxwaziyên girtiyên hatine qebûlkırın û li gor van daxwaziyên wê sererastkırineki çêbibe. Dî nava demeki kurt da xuya bû, ku hukumeta rezil derewa dıke, xelkê dıxapine û sozê xwe

bî ci nayne. Li ser vê yekê, dayik û bavên girtiyên cardın derketin meydana û derewên hukumetê li rûyê wî xıstın. Bî navê Saliha Şener û Rahime Şahin du dayikên dılsoz —ku berê dî merkeza SHP'ê da gotibûn, "Eger hukumet sozê xwe bî ci neyne emê li ber çavê hemû dınyayê xwe bişewitın!"— rojek beri cejna Remezanê li ber derê Belediye Diyarbekır û li pêş çavê hezaran kes benzınê bî xwe dakırın û nıftikê pê va danın. Dî nava alavan da pêra jî rûreşiya hukumetê qırkırın û slogan avêtın. Lê baş e ku xelk zû gıhişt wan û wana jî mırinê xılas kırın. Ew jî mırinê xılas bûn lê jî polêsê dewleta xwinrij xılas nebûn. Polêsan, herdu dayikan bî zor bırın qereqolê û ew xıstın bın çav.

Têkoşeriya van herdu jinên han, nımûneyeki canfidaiyê ye dî şerê azadiya gelê Kurd û Kurdistanê da. Ya duduyan, giringiya ciyê jinan dî têkoşına rızgariyê da.

Dayê  
Gava ez dūr ketim  
Ji dergûşa xwe  
Ji gundê xwe  
Ji welatê xwe  
Gava ez bûm mêvan  
Mêvanê xeman û hesretan  
Xewnên rojan û şevan  
Ketın navbera me  
Navbera min û te  
Disa bî salan û salan  
Wergêr û tercuman  
Li min dihejmêrin  
Naman  
Xêzan  
Gotınan  
Nahêlin ez ji te ra rêkım  
sılavan  
Li gor xastekên dılan  
Bî zımanê bav û kalan  
Ew li me pır dıbinın van mafan  
Dayê  
Ew dıtırsın ji stranên me  
Ji çirokên me  
Ji helbestên me  
Ew dıtırsın ji hebûna me  
Dayê  
Ew zor dıtırsın ji azadbûna me

GUNDÎ

## EZ IM KURDISTAN

*Ez im karkirê Kurdistan  
Ez im pêşverû  
Ez im şoreşvan  
Ez im ser çûn û ber çûn  
Ez im leşkerim  
Lî jêr tim xas û tezi  
Ez im birçî û bê malim  
Bin destê dijmin*

*Lê ez im gelperes  
Ez im xwudan gel  
Ez im li ser çiyay  
Tim dikim qirin  
Ji destê xwûnxaran  
Xwe bikim azad  
Ku eji bijim weki  
Însan û gelan*

*Dema ez parçebûm  
Bî destê dijmin  
Gele min nezân bû  
Ketim bin lîngan  
Çend caran min seri  
Hilda li xwe  
Hêza min biçûk bû  
Tev bûm perîşan*

*Dijminan pîr kuştim  
Xwûna min vexwar  
Lî her alî min  
Dîz, dijmin û qelaş  
Va xayinê Kurdistan  
Ez tev difrotim kedxwuran  
Çandi û dirok ji min  
dîstandin*

*Bî ser min xîstîn  
Ew ala xwe a pis  
Pêymal û talan bû  
Mal û konê min  
Bî nokêrê dijmin  
Begên Kurdistan  
Pelçiqiyam, ketim  
Disa rabûm ser lîngan*

*Mîn daniye pêş xwe  
Ramaniya karkir  
Tev zekirê dûre  
Ew tîzbi û xîşt  
Jî min ditirsîn  
Dijminê xwûnxar  
Rojhilata-Navin ku bikim bihişt*

*Ew ramaniya kevnar  
Mîn pîr paşva hişt  
Bî tektik û hêz  
Dihêrim bî ser û pişt  
Ew kedxwuran zanin  
Ez pêşva tême  
Teror qetliaman li min çêdikin*

*Ku ez Kurdistan im  
Lê netwa bin dest  
Hûn rabîn ser xwe  
Tev qata bin dest  
Lî humberî kedxwuran  
Deynî yekiti  
Mîn û xwe xelaskin  
Jî qata ser dest*

*Ez zanîm marksistê  
Ku çê bikim bî xwe  
Wekhevi deyinim  
Ezê li ser xwe  
Netwên bin dest û  
Kedkarên cihan  
Bî hevra şah bîbin  
Bî navê min û xwe*

*Ez ne anarşistim û  
Xwe nadim dijmin  
Ez ne feodalim ku  
Gel bîfiroşim  
Ez nabim irqçî ma  
Xwûn ke dimijim  
Ez xwe inkar nakim  
Çîma bitirsim*

*Ez im Kurdistan  
Tev çiya û zozan  
Ez im xwudan gel  
Ew ez im bî raman  
Va ez im pêşmerge  
Dî nav kêda tune  
Kedkarên Kurdistan  
Ez im rêça karkiran û  
Ez im sanzûman*

*Lî her alî min  
Dijminê xwûnxwar  
Bandikim haho tim  
Gelê cihan  
Ereb, farîz û türk  
Tevda tîn ser min  
Dixwazîn jî cihanê  
Rakîn navê min*


*Ne bese li ser min  
Qetliyam û kuştin  
Ew kesên çepok  
Dijminê marksist  
Bî lekan û dûbaran  
Mîn inkar dikin  
Nikanî xwe bîkin  
Vê rêça karkir*

*Hinek oportunist  
Lê hinek zirtone  
Bî teqlan û hîlan  
Xwe dikin zane  
Xebat nakin û xwe  
Înkâr dikin  
Weki dijminan tev  
Tîn ser min*

*Va ye min vekuriye  
Ew ala karkir  
Feqir û bin destan  
Tevda li pişt min  
Bî hêz bî raman  
Xebat geş bikim  
Bistinim Kurdistan  
Bîbim sosyalist*

*Feqir AHMED  
18.3.1982*

# FOLKLORISTIKA KURDI YA MUZIKI Û PROBLEMÊN WÊ



Nûra CEWARÎ

Muzika Kurdi Ya Gelêri dî nav kultura gîştî ya gelên rohilatê da ciheki hêja digre. Ev muzika çawa dî nav kurdan da, wisan jî dî nav gelên cinar da bî firehi tê naskirin û gelekî bî nav û deng e.

Hê dî dawiya sed sala buhuri da muzika Kurdi ya folklorî bala gelek kesan kîşande ser xwe, wek folklorist muzikvan, nivîskar, gero-kên pîr gelan û bî taybetî bo Ermenîyan ev muzika bû babeta gelek lêkolîn û xebatên muzikî.

Cara pêşîn xebatên muzika kurdi ango ef-randinên ku jî me ra nenasin, jî aliyê muzikvanê Ûrîs P.Siyalski (1) hatin nivîsandin. Lê belê ev nivîsarana tenê wek nivîsarên dokumên-tal tînin hesabandin. Jî bo berevkirina stranên kurdi, jî nav muzikvanên Ermenîyan da, ev kesana mijûl (xerîq) bûne: Kara-Murza, Komitas, S.Melikyan, A.Koçeryan, K.Zakaryan, S.Gasparyan û M.Tumacan. Dî warê parastina muzika kurdi ya kevnare û dî warê sazkirina dibîstanên netewî yê muzikî da van xebatana alîkarîke bî rûmet nişan dan. (2)

Dî nav jiyîna çandî ya Kurdên Ermenîstana Sovyet da bûyera mezîn peydabûna berevokên stranên gelêri va destpêkir, evana jî aliyê folklorist û muzikvanên kurd Nûra CEWARÎ û Cemila CELİL (3) da hatin nivîsandin. Heft berevokên Nûra Cewarî û çar berevokên Cemila Celil hatin weşandin.

Dî nav xebatên C.Celil yê dawîn (4) da gelek numuneyên muzika kurdi ya kêr hatîne nivîsandin yan jî bî temami qet ne hatîne nivîsandin hene, wek perçeyên muzikî-instrumental, beytên sed saliyên navîn, stranên dirûkî yê ku naveroka van berevokan dewlemend dîkin.

Jî hêsatiyê berbi çetnayê, lî ser vê prensîpê ev perçên muzikî jî bo gelek komên xwendevanan hatîne amadekirin û bî nav û deng in.

Ev tekstên stranên lî ser zar û zîman baş hatîne berevkirin, wusan jî dî tekstên muzikî da nezelalî, kêmasî hene, ev jî jî ber tesîra materyalên ku nehatîne bikaranîn, peyda dibin. (5)

Çawa dî berevokên kevn, wusan jî dî berevokên dawîn yê Cemila Celil da, stranên govendê (stranên listikê) ciheki mezîn digrin. Jî aliyê din 33 stranên govendê dî berevoka Ordixanê Celil û Celilê Celil ya bî navê "Folklorî Kurdi" (6) da çîh girtine.

Dî rewşa îroyîn da, dî warê berevkirin-nivîsandina nimunên folklorî yê muzikî da xebateke hêja jî aliyê muzikvanên lî derî welat (jî derî Sovyet) hatiye kirin. Dî sala 1978'an da lî Baxdadê bî notan va stranên gelêri dî nav berevokêke da, jî aliyê Enver Qeredax hat amadekirin, ya ku jî dengbêjê nav û deng Hesen Zîrek ra hatiye diyar kirin. (7)

Dî sala 1980'an da lî Swêdê bî navê "Muzik û huner" kovarek bî zimanê Kurdi der çû. Dî nav 14 hejmarên vê kovare da, gelek bend (nivisar) lî ser muzik û muzikvanan, rastiyên muziki yê cuda-cuda, perçên folklori, stran, efrandinên xwediyê kovare bî xwe angî Beşîr Botani jî Kurdîstana Iraqê (8). Disa jî aliyê wî da berevokeke stran û helbestan bî navê "Aşîti û Evin" (9) hatiye çapkirin.

Çawa dî nav weşanên E.Karadax, wusan jî dî nav yê B.Botani da stran û melodiyên gundîyan û bajari hene. Wana lî ser jiyîna muziki ya Kurdên Iraqê tabloyeke gîştî pêkanîne. Lê mîxabin ev nivisarana, jî ber jîhevderina xwe lî ser muzika gelêri û nivisandina teknîkî angî merc û daxwazên nûjen yê folkloristîka muziki bî temami ne rêk û pêk in.

Gelek materyalên dewlemend dî nav nivisarên muzika Kurdi, bî mekanîkî tîn parastî. Ewana bî destê dewletê û kesên şexsî da tîn xwedîkirin. Dî Instutita Edebiyata Ûris AN, SSSR, dî Instutita Huner AN, Arm SSR, dî Konservatura Dewletê lî Tîblîsê. Hîn nivisarên E.Evdal, X.Kuşnaryan, A.Koçaryan, B.Axobadze. Jî nav van xebatên şexsî da xebatên G. Cîxîkvadze, Cemîla Celîl, Nûra Cewarî bî nav û deng in.

Dî warê folklorî Kurdi ya muziki da xebateke mezî jî aliyê weşanên Kurdi yê Komîta dewletê ya Radyo û Televîzyonê lî bajarê Erevanê lî Ermenîstanê da tê çêkirin. Dengbêj û sazbandên here bijarte dî van weşanan da kar dîkin. Disa dî vî wari da xebateke berbîçav jî lî bajarê Bexda û Kermanshahê da tê pêkanîn.

Dî warê lêgerîna muzika Kurdi da heta niha kêma xebat hatîne çêkirin. Diyarê ku, dî sala 1896'an da lî Berlinê Komîtas bî qedandina konservatuarê, lî ser muzika Kurdi xebitî, lê pîr mîxabin, ev xebatana ne hatîne parastî. Heta niha tenê çend nivisarên Komîtas lî ser muzika Kurdi dî nav bendên wî yê jî bo muzika Ermenî ya gelêri da hatîne nivisandin, gîhiştîne destên me. Dî warê pîrsên teorîk yê muzika Kurdi da wusan jî van muzikvanên Ermenî baweriyên xwe diyar kirîne; V.Korganov, S.Melikyan, S.Gasparyan. Dî warê pîrsên muzika Kurdi yê cuda-cuda, ev xebatana bêşik xwediyê nîrxekî zanîstî ne. (10)

Dî sala 1976'an da lî Ermenîstanê Instutita Huner, monografiya Nûra Cewarî ya bî navê "Hunera Stranbêjiya Gelê Kurd" bî zimanê Ermenî weşand. Dî nav vê xebatê da pîrsên jî-

yîna muziki ya gelê Kurd, cure usul û stilên stranên kurdi, hatîne pêşkêşkirin.

Her çiqas ev xebatana hatîne çêkirinê jî, muzika Kurdi ya gelêri, dî warê folklorî kurdi da zêde nehatiye lêgerîna û berevkirin, xebatan zêde berdewam nekîriye. Dî rewşa îro da berevkirin û lêgerîna muzika gelêri hewcedarî xebatên gelek bî fesal in, wusan nebe gelek nîmûnên çanda gel yê kevn roj bî roj wunda dîbin. Xebatên ku îro tîn çêkirin ser himê helbestvanîyê tîn meşandin, beşeka wana bersivên daxwazên zanîstî nadin.

Dî vê munasebetê da pêwîstê em lî ser pîrsên kemalî destxistîna berevkirîna nîmûnên nûh yê efrandariya gelêri bîsekînin, jî ber ku heta niha beşa bîngêhin ya hemû perçên muzika Kurdi yê berevkirî jî stranên listîkê-govendê pêk tîn. Sedemên vê bûyerê baş nezîna jiyîna muziki ya gel e, bî zêde hêsayî hînbûna gotmên stranên govendê, dema mîrov bî stranî (perçana) dî warê muzika Kurdi û zîmanê kurdi da perwerdekarîke cuda dîxwazî. Nîmûnên ku dî nav efrandariya gel da hene yê ku angî stranên listîkê dî nav muzika kevnare da cihekî bîlînd girtîne û dî efrandariya gel da dî nav qatên kûr da dimînin, gelek bî nîrx û navdar in. Ev stranên bî dilşewat, stranên bî serpehati, diroki, lirîkî, yê ku angî yê dawî jî perçên xwendîna destanên gel û serpehatiyên diroki pêk tîn.

Perçên stranî ya valahiyên çîrokê-destanê tîjî dîkin yan jî efrandinên bî serê xwe û tam in. Çîrokbêj bî normal lî ser bûyerê deng dîke û perçên helbestvanî dîstrê, an jî tenê perçên helbestvanî dîstrê, dîvê em hemû navdariya çîrokê haj pê hebî. Ev stranîntîbake baş nahêlî, eger çîrok (serpehati) bî xwe tune be.

Xêncî stranên jorgotî dî nav gel da wusan jî nîmûnên nezê de hene, wek nîmûne, perçeyên destana (eposa) gel ya mîrxasiyê "Dîm-Dîm" ê stranên xebatê, stranên jiyîna malbatê û herwekî dî.

Stranên heta niha hatîne nivisandin û berevkirin lî ser himên stranên govendê peyda bûne û wisan jî muzika gundan temsîl dîkin. Eva tîşteki ecêbe ku heta van demên dawî muzika Kurdi wek muzika gundîyan (ne bajarvanî) dîhate zanî. Eva encamên wê yekê ye ku, ev stranên gundîyan angî stranên curên mayî dî nav efrandariya gel ya stranî da, cihekî herî mezî dîgîrî. Gelê Kurd wek pêwendiyê nîzîk û teng bî jiyîna gundîyê va pêk a-

niye, muzikeke gundiyan yeke dewlemend peyda kırıye, ya ku gıyanê (ruhê) netewi destjêhatinên efrandariyê û rûçikên (wesfên) hunera bikaraninê temsil dıke.

Baldarîke ne piçûk ya zanîstî ji, dî curên stranên mayîn da pêk tê, orjinalîta wan ya eşkere ne tenê ji cudabûna rolên wan yê bî taybetî tê, cudabûna wan ji stranên gundiyan ji rûçikên muzîki-helbestvani tîn. Ev stranan yê dengbêjîyê, bajariyê û olperestîyê ne.

Hunera dengbêjîyê ya kurdi wusan ji dî nav hunera dengbêji-gunditîyê ya gelên rohilatê da cih girtiye û perçeki beşa hunera dengbêjiya rohilatê pêk tîne. Ev hunera çawa dî nav Kurdên Sovyet, wusan ji lî Kurdistanê bî xwe tê parastin û dî warê çanda gelêri ya muzîki da ciheki girîng û bî hurmet girtiye, ev yek a iro ji berdewam dıke.

Pêkhatin û pêşveçûna stranên bajari bî bejndana bajarên kurdi, peydabûna ronakbiran (rewşenbiran) û hişyarbûna xwezanîna netewî ya gel va girêdaye. Van stranan lî Kurdistanê destpêkirîne hêdi-hêdi û geleki populer bûne.

Dî efrandariya strani ya kurdi da, warê herî tevlihev (aloz) dî stranên olperestî da peyda bûye. Vê gavê em tenê stranên olperestî yê Kurdên Êzîd baş dînasin. Ewana dî nav kurdan da tehr (form) û orjinalîtek lî ser himên çanda pûtperestîyê ya kevî, destxîstîne. Stranên olperestîyê wusan ji bîngêhên wan yê profesyonelî hene.

Lêkolînên lî ser şax û beşên efrandariya strani gelek girîng in, ev yek a wusan ji alîkariya izgeriyên dîr û dirêj dıke, ji bo berevkirîna hemû nimûnên folklorê.

Beşeke girîng ya muzîka kurdi ya gelêri wusan ji, ji perçên muzîki yê instrumental, şivanîyê, lirîki, listîkê yê ku heta nîha gelek kê m hatîne nivîsandin, berevkirîna pêk tê.

Perçên muzîki-melodî yê şivanîyê binnefeseke wan ya kûr-fîreh heye. Ewana şeng-şepalî bedewîya jîndariya hisên şivanan ifade dıkm. Ewana ji destanên lirîki pêk tîn. Ev efrandinên han gelek hunerbîlînd in, ji aliyê dî bî stranan va tevayî dî konseran da tîn gotin.

Eva tiştêki ecêb e ku perçeyên muzîki yê lirîki yê ku dî nav muzîka babetî da cih girtîne, naverokên wan yê cuda hene. Serhatiyên (çirok) wan lî ser zîmanê gel, dî serborîya gel ya dîroki da tîn xweyîkirîna, her wusan ji beşekî hewcedariya pêwîst pêk tînin.

Stranên govendê (listîkê) ya melodiyên bî serê xwe ne yan ji melodiyên stranên govendê yê navdar in. Ev beşbûna muzîka instrumentan peyda dıbe. Ev strana bî nispi diyapzoneke wan ya fîreh û pêştacıyîneke wan ya melodîk heye. Beşa întresant (balkêş) ya muzîka instrumental wusan ji, ji cîvîn-merasîman pêk tê, wek perçeyên dilanan, nêçîrê û her wekî dî.

Perçeyên instrumental bikaranîna instrumentalên muzîki yê cuda va, beşeke muzîka kurdi ya dewlemend û gıranbîha pêk tîne û ev perçeyên wusan baldarîke girîng peyda dıke.

Jî derî diyarbûna van stran û perçeyên nûh baldarîke taybetî (mexsûs) dî warê hîlbijartîna wan da pêk tê. Muzîka kurdi wek hunera muzîki ya gelên mayîn karakterê xwe yê xurî (orjinal) heye. Lî ser himên vê muzîkê, sistema meqam-dengkirîna cuda, prensîpên pêşkertîna melodîyan û peydabûna forman cih dıgırî Dî rewşa iroyîn da rûçikên (xususîyet) stranan bî tehr û usulên vuda va tenê dî nav çarçevên gıştî da diyar bûne. Lêkolîn-hînbûna orjinalîta muzîka kurdi bî berevkirîna rastîna ya stranan va dîkare derkeve maderê.

Wusan ji lî ser pîrsa çêkirîna û weşandîna berevokên muzîka kurdi yê folklorî baldarî (guhdarîke) mezîna hewcedar e. Berevokên ku peyda dîbîn karakterên wan yê populer hene, dî nav wan da materiyalên lî ser nexebîtî hene. Lî ser metodên sistemkirîna materiyalan dem hatiye wekî kesên berpîrsîyar angorî demên nûjen serê xwe bîşînin.

Karên dî warê berevkirîna û lêgerîna nimûnên muzîka kurdi ya gelêri da bî taybetî lî Ermenîstana Sovyet hatîne çêkirîna û nîha ji tîn meşandîna. Dî dema me da, vê demê muzîka kurdi zêde nehatiye lêgerîn, lî komarên Yekîtîya Sovyet, Gurcîstan, Azerbeycan, Turkmenîstan, Kırğıstan, Kazaxstan û her wusan ji lî Kurdistanê bî xwe, ya ku dî navbera Irak, İran, Tırkiyê û Sûriyê da hatiye beşkirîna ev karana kê m hatîne lêkolîn. Berevkirîna û lêkolîna muzîka kurdi lî van hereman (hêlan), wê safîkirîna gelek pîrsên girîng bî xwe ra tevayî bîne.

Jî der beşbûna axa (erd), kurdi wek gurub, zaravên cuda-cuda deng dıkm, ev gurubana grêdayî vê yekê ne û dî nav wan da mezhebên cuda hene.

Pêwîst e bê diyarkirîna ku, xebatên heta nîha hatîne kîrmê, ji aliyê Kurdên Êzîdî yê ku zaravê kurmancî dîpeyivîn, bî destê wan hatîne meşandinê. Eşkere ye ku dî nav pêkanînen

civaki yên cuda, mercên-hoyên sosyal, grê-dayina bî gelek zarav û mezheban da gel zarav û devokên muziki yên cuda pêk aniye. Ji aliyê din folklorê ku di nav gel da beş bûye, rûçikên (xususiyet) wê yên nişandar hene, her wusan ji karektereki wê yê hemû-netewî heye. Di vê munasebetê da ji problemên bingehîn yên folkloristika kurdi yek ji, bî zanistî rûberî-hevkîrîna folklorê gel ji beşên cuda ye, diyarkîrîna tevayî û reng-awazê wê yên navdar in.

Wek hunereke bî serê xwe, muzika Kurdi ji aliyê din da xeleşokeke çanda tevayî ya gelên rohilatê pêk tîne. Bî sedsalan Kurda bî gelek gelên mayin ra cinartî kirîne. Lêgerîna pêwendiyên kultura van gelan bî hevra, tesirên wan li ser hev, wê bersiva gelek pîrsên nûh diyar bike, alikariyê bide.

Ajotîna van karan wê bî gelek nîşan bajo. Lê belê iro bî guhastîna folklorê gel ya kevn va tevayî, pêwîst e em pîrsa perwerdegariyê, pîsporkîrîna (gihandî) kadroyan amade bikin, ev pîrsa pêwîst e hem kurdzanan, hem rohilatzanên mayin mijûl bike. Ji ber ku pîrsên muziki bî pêwendiyên teng va bî rohilatzanîyê va hatîne girêdan. Diyarkîrîna pêwendiyên çandên manevî yên gelên cuda kemala wan ya zanistî û giring heye.

#### ÇEND TÊBÎNÎ

- 1 "Wênêkîrîm" Nêrina Cihani, cild 8, 1861, Petersburg, rûpel 284.
- 2 Binêrîm, N.Cewari "Hunera Stranên Kurdi Yên Gelêrî" (bî zîmanê Ermenî) Ere-

van 1976, rûpel 7 - 27.

- 3 *Bibliografya Weşanên Folklorê Kurdi Ya Muziki*, 1972, li xebata N.Cewari ya jorgotî binêrîm, rûpel 179. *Berevokên Nuh : Celîla Celîl, Stranên Kurdi Yên Gelêrî û Perçeyên Instrumental*, Moskova 1973, *Stranên Kurdi Yên Gelêrî*, Erevan 1977. N. Cewari, *Yekrê No: 1, 23, Berevokên Stran û Perçeyên Muziki Yên Instrumental* (bî B.Botani va tevayî) Stockholm 1981 Uppsala, 1982 Vasteras, 1983 (Swêd), *Stranên Kurdi Yên Gelêrî*, Erevan 1983. *Stranên Kurdi Yên Gelêrî*, Erevan û *Perçên Instrumental* (di nav salnama nivîskarên Kurd "Buhar" da 2) 1983 Erevan.
- 4 *Lî ser herdu cildên pêşîn, binêrîm xebata N.Cewari ya nav li Jorgotî*, rûpel 16 - 18.
- 5 *Gelek stranên hatîne nivîsin bî tempoyan va cih ne girtîne, di nav wan da xetên tak-tan tunî û her wekî din.*
- 6 *Folklorê Kurdi, cildê duwemîn*, Moskova, 1978.
- 7 *Hesen Zîrek*, 1978, Bexda.
- 8 *1978 مەسەن زێرەك، چاپی سەمێ هەمەین، بێغاد ۵، ۱۹۷۸*
- 9 *Muzik û Huner, xudan û berpîrsiyarê korê*, Beşîr Botani, Swêd.
- 10 *Beşîr Botani, Aşîti û Evin, Stran-Helbest-Muzik*, Uppsala, 1980.
- 10 *Binêrîm xebata N.Cewari ya Jorgotî*, rûpel 13, 47, 99.

(Ev lêkolîna Nûra Cewari, ji Rûsî hate wergerandin.)

□

## Nawenda PEN a Kurdi hat damezrandin

Îsal di 6-9'ê Nisanê da, li bajarê Cambridge li Ingilistanê, Konferensa Yekîtiya Nivîskarên Cihanê—PEN cwiya û di rojevê da damezrandîna Newenda — PEN a Kurdi ji hate pêş.

Di cwîna nuwêneran ya 8'ê Nisanê da sekreterê giştî Aleksander Bloch, li ser navê nivîskarên çar parçên Kurdistanê û yên li derwayî welat, Huseyin Erdem vexwendê kursiyê axiftinê. Huseyin Erdem ji nuwêner ra pêwîstiya damezrandîna Nawenda PEN a Kurdi şirovekir û bang li wan kir ku piştgiriya vê daxwazê bikin.

Damezrandîna Nawenda PEN a Kurdi bî yekîtiya dangan hat qebûlkîrî û bî şahî hat pî-rozkîrî.

Dûra li ser daxwaza PEN-Swêd, li dijî hukmeta Iraqê ku li hember gelê Kurd gaza jehrê bî karaniye, hate protestokîrî û biryar hat standin ku ji bo piştgiriya gelê Kurd bangek nivîsandî bête belavkîrî.

Damezrandîna Nawenda PEN a Kurdi, di warê navnetewî da gaveke nû ye û em hêvidar in ku ew ji di warê xwe da dengê gelê me bigihîne gelên cihanê.

# hevpeyvîn

digel endamê Komita Rêvebir ya Yekitiya Niviskarên Kurdistan—

## HEME KERİM ARIF

□ *Tu dikari derheq damezrandina Yekitiya Niviskarên Kurdistanê (YNK) bi kurti agahdari bîdi me?*

H.K.ARIF: Nebûna azadiyên siyasi, grêyek e li ser riya pêşkevîna edebiyatê. Bêguman gava dewleteke polisi li ser hukum be, edebiyat nikare geş bibe û bête nivisandin. Eger bête nivisandin ji, ew bi peyvên bê nave-rok, ji saha mirovatîyê dûr, ji azadiya zehmetkêşan dûr û ji hawara azadiyê dûr dikare bête nivisandin. Edebiyat, çalakîyên here re'sen ê mirovatîyê ye, xebata mirov bona azadiyê di-de xwiyakirin û rê bona hindê xweş dike ku, mirovek bikaribe xwe têkili civatê bike.

Her ji ber vê ditimê ye ku, di Kurdistanê Başûr da hindê niviskarên şoreşger di sala 1980'an da berê xwe dan çiya û rêxistinê bi navê "Yekitiya Nûserani Kurdistan" damezrandin.

□ *Mercên endametiye di YNK'da çi ne?*

H.K.ARIF: Her niviskareki Kurd yê dilsoz û şoreşger, ji kijan parçê Kurdistanê dibê bibe dikare daxwaznameyê endametiye bîşîne bo "Desteyê Birêveberî ya YNK" û bibe endamê yekitiyê.

□ *Li Kurdistanê çend liqên YNK hene?*

H.K.ARIF: Bili Malbenda giştî ku organa wê ya weşani "Nûseri Kurdistan" e, liqa Kerkuk ji heye. Organa liqê Kerkuk kovara "Gizing" e. Em berdewam dixebitîn da ku liqên din ji li parçeyên din ê Kurdistanê da bidine xebatê. Em hêvidar in ku niviskarên dilsoz û şoreşger yê parçeyên din ên Kurdistanê wê bersiva vê daxwaza me bidin û em bikaribin zûtir vi erkê hewceyî ci bî ci bikin.

□ *Dikari xebata YNK ji damezrandinê heya niha ji me ra bêji?*

H.K.ARIF: Piştî ku YNK hatiye damezrandin heta niha hindê civinên edebî bona pêşmergeyên Kurdistan û xelkê zehmetkêş ku li

navçeyên rîzgarkirî ên Kurdistanê Başûr dijin, hatine çêkirin. Kovara "Nûseri Kurdistan" 13 hejmar, kovara "Gizing" ku yek ji wan şano ye û evê di behsa hunermendê nemir ê Kurd Yılmaz Guney dike hatine çap û belavkirin. Kovara "Gizingê Biçûkan" ku taybetî bona zarokan e 3 hejmar hatine weşandin.

Bili wan ku min behs kir, me 42 pirtûkên edebî ji çapkirin. Ji wan yê ku navê wan di bira min da mane ev in:

1- Sê Dadîga, Mihemed Mukri. 2- Tole, Mihemed Munri. 3- Nêçir, Mihemed Mukri. 4- Heres (Roman), Mihemed Mukri. 5- Sê Rêber (Wergêr: Mihemed Mukri). 6- Nina, (Roman) Sabit Rehman, (Wergêr: H.K.Arif). 7- Pênasnamekan (Wergêr: H.K.Arif). 8- Namo, Alber Camus (Wergêr: H.K.Arif). 9- Hewmalakan, (Wergêr: H.K.Arif) 10- Amanci Edebiyat, Gorki, (Wergêr: H.K.Arif). 11- Pêşmerge Biçkoleke, (Wergêr: H.K.Arif). 12- Xaki Dayik (Wergêr: Necibe). 13- Halo, helbest, Şêrko Bêkes. 14- Awenê Biçkolekan, helbest, Şêrko Bêkes. 15- Keşkoli Pêşmerge, helbest, Şêrko Bêkes. 16- Rûberrû Li Sêberî Çiya da, Heval Kwêstani. 17- Kêşeyî Kurd B.Şêrko, (Wergêr: Mihemed Heme Baqî). 18- Raperîni Kurd 1880, Celilê Celil, (Wergêr: Sami Şorîş). 19- Robarê Xwin, helbest, Cewher Kîrmanc. 20- Çepkê Xemi Kesk, helbest, E.K.Arif. 21- Geranewê Bo Hayfa, (Wergêr: E.K.Arif). 22- Dilê Dagîrsawî Danko, (Wergêr: E.K.Arif). 23- Berew Çiya, Rêbûar. 24- Komara Milli Mehabad, Mehmûd Mela Îzzet. 25- Diwana Şehîd Mela Eli. 26- Diwana Şehîd Cemil Rêncber. 27- Diwana Şehîd Barzan Osman. 28- Diwana Şehîd Şemal. 29- Yadname, helbest, Halkewt. 30- Bahoz, helbest, Sabîr. 31- Yadi 200 Saleyî Silêmani, Antoloji.

Diyar e, ev berhemana ji daxwaziya me geleki kêmtir in. Lê belê çî dikarin bikin (!). Xelata (diyari) şivan e. "Diyariya şivên ji an Sping e, an ji Alekok e"

□ *Îro li Kurdistanê Iraqê da xebata çekdari heye. Diyar e xebata çekdari gelek astengi û*

dijwariyê li ser jiyana gelê me pêktine. Ji ali-yeki din va pêşmergeyên gernas û mêrxas li diji dijmin şer dîkin. Bî ditîna we, xebata gelê me xwe di nava huner û edebiyatê da dide xwiyakirin?

**H.K.ARIF:** Bêguman, edebiyat û huner bî çalakiyên zihni yê mirov in, jî xwiyayi (fenomen) û bûyerên dorûber cuda ninin. Huner û edebiyat rêçik in bona azadiyê. Şêweyên azadixwaziyê ne. Gava kesek vê rêyê bigre pêş-berî xwe, bîvê-nevê hewcedari azadiyê ye. Hemû qelem û qelemkêş, eger dixwazim bîbin xwediyê peyamên (mesaj) bîlind û pîroz, divê rêçikeke bî peyam û bî armanc bigrin ber xwe û jiyane jî peyamên xwe ra bîkîm çavkani.

Diyar e ev jiyana realisti ya rojane bîlindtir, germtir, gurtir û ahengtir be. Ev afrandîmên ku hunermend diafrîne divê nîmûne bîn ku xelk bî wan bir û baweriya xwe, jiyana xwe baştir biguhurine.

Nivîskar û hunermend alahilgrê mîlet in. Ew xasîyetên taybetî yê netewe û welatê xwe dîgrin û dîçin nava kûrahiya gel, ditîmên gel û xebata wê tînin û di nava peyvên re'sen û rastiyan delal da dixemlinin û daxwazên gel didin ber çavan.

Ango nivîskar û hunermend jî hemû alemê agahdar in. Ew kesên ku agahî jî hemû alemê hene, divê her dem di nava civatê da bîn. Û herin jî xelkê ra rastiye bêjin, çekê edebî û hunerê bîdîm destê civatên zehmetkêş û karker da ku di xebata rîzgariya xwe da bixebitînin, dirokê berbî pêş bîbin. Jî ber ku, rîzgariya mirov bî rîzgariya zehmetkêş û karkeran va girêdayî ye.

Diyar e xebata gelê Kurd li Kurdistana Başûr rastiyeke e û nayê inkarkirin. Pêşmerge ew hunermendê hêja ye ku bî canê xwe çiroka serketîna gel dimîvise...Êdi çawa navê wan ku li ezmanê edebiyat û hunera Kurdi da wek stêrk in, neynin ser zîman...

□ *Dîkari li ser astengi û dijwariyên ku li ser riya têkoşîna we hene behs bîkî?*

**H.K.ARIF:** Bî ditîna min gava peyva "Têkoşîn" bikeve ber gûhê mirov, fîkra insan yekser dîkeve nava komek astengi, pîrs û dijwari. Bona vê yekê, yekek erk, jî erkên xebatê serketîna e li ser wan astengi û pîrsan da. Ez dixwazim pîrsek jî pîrsên me binim ber çavan ku ev jî kêmbûna tirajê afirandîmên me ye.

Çend xweş e gava berhemên me yê nû tînen çapkîrîm, lê belê ewqas jî nexweş e ku, ew

kêm dîghên destê xwendevanên parçeyên din ên Kurdistanê, gelek pêşmergeyên Kurdistanê jî jê bêpar in.

□ *Pêwendiyên we digel nivîskarên Kurd yê parçeyên din ên Kurdistanê û yê li Ewropa dijîn?*

**H.K.ARIF:** Ya rasti ev e ku, jî ber dijwariyên hatîm-çuyîm û polêsê ser rê û eskerên ser sinorên bîdestçêkîrî em kêmtir hevdu dibînin. Û pêwendiyên me di çarçeviyê hevdengi da ye. Bona şîdandîna pêwendiyên me, xebata me berdewam e û em carna wan sinorên bîdestçêkîrî jî pêpes dîkîm.

Ez jî vîr, jî Kurdistana Başûr, meydana şoreşê silavên xwe yê germ û gurr pêşkêşî bîrayên xwe, hunermend û nivîskarên Kurd yê parçeyên ditir ên Kurdistanê dîkîm û vê çendê disan dibêjim ku, YNK çepera hemû qelemên dilsoz û şoreşgerên Kurdistanê ye.

Li Ewropa mamosta Doktor Kemal Fuad nuwênerê YNK e û pêwendiyên me bî destê wî tînen girêdan.

□ *Nivîskarên Kurd yê ku li Ewropa dijîn, dixebitînin ku li Ewropa rêxistinêke nivîskaran pêk bînin. Li ser vê yekê ditîna te çi ye?*

**H.K.ARIF:** Min pêşda hîndek xebatên YNK behs kir. Bî ditîna me hewce ye ku malbenda gîştî ya rêxistinê nivîskaran di nava pêşmergeyan da be, di nava zehmetkêş û şoreşgerên Kurd da, li Kurdistanê be. Li kijan parçeyî dibe bila bibe... Helbet ev jî bî hal û merc û imkanatan va girêdayî ye. Ev xebatên ku hûn behs dîkîm, divê zêdetir bînen kîrîm ku, mektebeke (şube) YNK li Ewropa û eger imkanat hebe li derên din jî bînen damezrandîna da ku anegorî karîna xwe edebiyata kurdi û doza Kurdistanê bî xelkên din bîdîm nasîna.

Pêşniyarê min bo wan hevalan ew e ku, bîxebitînin di Ewropa da bî mamosteyan Dr. Kemal Fuad û Şêrko Bêkes ra pêwendî dayînin û ligel wan li ser vê meselê qise bîkîm.

□ *Peyamê (mesaj) we jî bo xwendevanên Roja Nû û nivîskarên Kurd li Ewropa heye?*

**H.K.ARIF:** Ez qasî peyamdayîne mezînin in. Qedîr û silavên min hene bo wan. Hêvidar in serkevtî bînin û jî gelê me ra xîzmetê bîkîm. ■



nin. Lê ki dikare isbat bike ku ispanyoli ji elmani feqirtir e?..

Lê belê di zimanên welatên paşdamayi da navê gelek tiştên nûjen (modern) tunene û ji ber vê ji ew wek zimanên feqir tên hejmartin.

Lê bi hêsani karanina zimaneki ne tenê grêdayi wê yekê ye ka çend peyv di wi zimani da hene -ji bo zimaneki kifş- Lê grêdayi wê yekê ye ku ew dikare xezina xwe ya peyvan zêde bike, ji bo her hewceyi û kêmsiyên nû. Gelo ji kingê va peyvên wek OTOMOBÎL, DATA, ATOM, ROBOT, TELEVÎZYON di zimanê swêdi yan ji ingilizi da hene?...

Lî piraniya welatên Ewropayê, zimanên nivisandinê standard bûne. Pêkhatina wan wek zimanên standard, bêtir di salên 1800'i da bûye, ku hingê nasyonali bi xurti fireh dibû û gelek milletan xwe rîzgar kirin. Ew zimanên ku standardbûna xwe zûtir (di wextê da) temam kirine, di wan da gelek caran di navbera şeweyê nivisandina kevn a peyvê (ku hingê fonetiki bû, ango çawa dihat nivisandin wisa ji dihat xwendin) û telefûza iro da ferqên mezûn peyda bûne. Ingilizi û fransi ji bo van zimanan numûneyên berbiçav in, lê herweha di swêdi da ji ev ferq bûye problemeke mezûn. Îmla swêdi di wexteki wisa da hatiye kuşkirin ku hingê ne dengê Ş yan ji TJE hebû, û grûbên konsonantan (tipên bêdeng) wek DJ HJ SCH LJ dihatin telefûzkirin. Hin iro ji di fransi da gelek paşpirtik tenê di zimanê nivisandinê da hene.

Bi sedan ziman hene -Bi taybeti li Afrika û Asyayê- ku li bendeyi standardbûnê ne. Li gelek deran hewl didin ku standarda kevn ya ku ji aliyê kolonyalistan hatine saz kirin, biguhirnin.

Lî Afrika Rojhilat carna yek zimanek bi du şeweyên nivisandinê hatine xebitandin, ji ber ku nivê welat koloniya Fransa û nivê din ya Ingilistanê bû.

Ne tenê hîlbijartina zaraveki, lê herwisa hîlbijartina yek elfabeyeki ji zehmet e. Mesela elfabeya erebi ya bê vokal (tipên dengdêr), bêşik xwendina zimaneki ku têda gelek fonemên vokal hene mesela wek zimanê turki û swêdi, zehmet û dijwar dike. Em çend peyvên swêdi wek nimûne bigrin, ku di nivisa erebi da ferqa nabeyna wan gelekî zehmet tê ditin: Vill / ville; massa / missa / mossa / mäsä / mössa.

Lî gor ditina gelek kesan, bi karanina îşaretên li ser û binê xeta nivisê qet praktik nîne, çimki ewana ji para xwe zêdetir ci digrin.

Gelek caran hîlbijartina şeweyê nivisandinê zimaneki (imla û elfabe), ji sebebên zimani

bêtir li gor hin faktorên din dibe. Beri her tiştî kevnêşopi (tradisyon) û hewcedariya ku mirov bikaribe nivis û eserên kevn yên ku berê bi wi zimani hatine nivisandin, bixwîne, rola mezûn dilize. Lema ne li Fransayê, Ingilistanê, DAY (USA), Swêdê û ne ji li Japonyayê, di wari da reformên mezûn çênabin.

Miletên ku iro dixwazin zimanê xwe yê nivisandinê bigihin standardeki, bêşik dikarin sistemeke nivisandinê ya wisa bibjêrin ku hemû fonemên wi zimani bide.

Problemeke din ji kuşandina sinorê navbera ziman û zaravê ye. Bêşik zimanek ji gelek zarav û devikan pêk tê, lê carna dema ku du zarav ji hevdu ewqas dûrketibin û mirov ji hevdu fam neke, hingê zehmet e ku mirov wan wek diyalekteki yan ji wek zimaneki cuda qebûl bike.

Gelek caran faktorên politik, dini yan ji diroki sinorên zimanan dikşinin. Mesela ji bo gelek swêdiyan norveçiya- Oslo ji "zaravê Älv-dal" yan ji "zaravê Fårö" (li Swêdê) hêsantir e. Herçend ji ew wek zaraveki zimanê swêdi ji tîn qebûlkirin.

Carna ji tam hevrikê vê, intressek heye ku ferqên navbera zaravan zêde tîn mezûnkirin, mubalaxakirin. Wek nimûne hin kes li DAY iddia dikin ku ingiliziya ew dipeywin, ji ingiliziya Ingilistanê cuda, bi serê xwe zimanek e.

Heta niha min behsa zimanê nivisandinê kir, lê standardkirina zimanê axaftinê (qisekirinê) tiştêki din e. Mesela intonationên (muzika hevokê) ku di zimanê nivisandinê da qet nayê nişandan.

Berê li Swêdê, li diji guhastina "Zimanê Dewletê" tolerans gelekî hundik bû, bi taybeti bona nûçebêjên (spiker) radiyo û TV'ê. Lê niha ev çend sal in ku li wir ji êdi hin tişt hatine guhartin.. Bêşik gereke telefûzeke wisa be, ku piraniya kesên navça wi zimani jê fam bikin.

Erk û pêwistiyeke pêşin û giring ji bo yên ku dixwazin standardkirina ziman pêk binin ew e ku beri her tiştî tesbit bikin ka ew ziman çawa tê qisekirin.

Helbet gelekî di ci da ye ku ew peyvên tevayî (muşterek), formên peyvan ên tevayî, ku piraniya xelkê bi kar tîne, bîn tercihkirin, eger sedemên din li diji vê tunebin... Hingê hêsantir ji dibe ji bo ku mirov bîzanibe kijan variantan bide ber hev. Dema di navça zimaneki da, hin peyv yan ji formên peyvan, li ciyekî bîn manêki, û li ciyekî din maneke din, hingê dijwar û zehmet e. Lê eger ew variantana li famkirinê (têgihîştinê) tesir nekin mirov dikare bihêle mesela herkes zaravê xwe, qet nebe di literatura bedewiyê da, bi kar bine. □

## ARİF SEVİNÇ



### ● Dı zindanên faşist da berxwedan

### ● Lı derva teşhirkırın û rûreşkırına faşizmê

Dı Tırkiyê û Kurdistanê da pêşveçûna tevgera şoreşger û welatparêz çavê kolonyalistan tirsand. Ji bo ku aboriya xwe ji astengiyê derxinin û pêşiyê li xebata şoreşgeri bigirin û hêzên wan bipelixinin bi destê CIA'yê cunta faşist anin ser hukum.

Ji wê wextê virda bi destê dewletê, bi plan û program li ser gelê Kurd û Tirk "terora spi" tê bikaranin... Bi hezaran kes hatin girtin. Bi gullan, êşkence û lêdanan bi sedan kes hatine kuştin û gelek kes ji ber êşkencan seqet man. Bi kurtayi zindan bûne cihê qetilkırına kesên şoreşger û welatparêz.

Êşkence û barbariyên ku di Tırkiyê da, xasîma di Kurdistanê da li ser girtiyên hate kırım dema Hitler ji paşve hiştiye.

Hepsa Diyarbekirê û Erzurumê him êşkence û zulm ditinê da him ji li hember dijmin seri bilind girtinê da xwedi nav û deng e.

Gelek welatparêzên Kurd di girtixana Diyarbekirê da hatin kuştin. Lê digel hemû zulm û hovitiya xwe dijmin nikaribû pêşiyê li hişyarbûna gelê me bigre û têkoşerên girti dil û poşman bike. Têkoşerên Kurd bi mêrxasi û bi berxwedaneke efsanevi ala azadiyê di zindanên dijmin da jî bilind girtin. Ji dijmin ra seri netewandin. Bi hemû rê û şêwan rûreşiya faşizmê dane xuyakirin.

Îro ji kesên têkoşer, şoreşger, çî li hundur çî li dervayi welat û çî ji di hepsan da li diji faşizmê û kırımên faşizmê xebata xwe sarnakûn. Ji wan têkoşerên yek ji heval A. Sevinç e. Heval Sevinç di navbera 1982 -86'an da çar salan di zindana Diyarbekirê ya xusûsi-eskeri da raza.

Lı vêderê weka girtiyên din A. Sevinç ji di nav van çar salan da êşkence û zordariyên curbecur dit. Êşkence bûbû parçeki jiyana girtiyên. Lê wi tu wextekê hêvi û baweriya xwe wînda nekir. Ne di zindanê da ne ji pısti ku derkete derva li hember faşizmê xebata xwe sist nekir.



SIRADA 35 × 50 cm


Pîştî ku ji hepsê derket xwest ku kîrînê faşizmê di nav gel da bide naskirin û êşkenceyên ku welatparêzên girti ditine pêşkêşî gelên cihanê bike. Bala ronakbir, aştixwaz, pêşverûyên hemû cihanê bîkşîne ser rûreşîya faşizmê û ku li dîji wê rawestin.

Bona vê yekê ye ku wi dest bîriye firçe û paletê xwe. Êşkenceyên ku li wi û hevalên wi hatine kirin û rewşa girtixana Diyarbekrê di wêneyên (resim) wi da, bi rengên jindar û bi detay tîn ber çavê temaşevanan.


Di quncikê tari da bi destê kesên bê insaf û bê wîjdan va çawa li ser girtiyên gelê me cureyên êşkence hatine ceribandin, wi ev aniye ber çavan. Bî rasti ji Arîf Sevînc bî hunermendike xurt zulma faşizmê, barbarîya kolonyalistan û li dîji wan ji berxwedana ewladên gelê Kurd di resmên xwe da baş nîtrandiye.

Ev xebata wi ji nîmûneyeke ku dîde xwiya-kirin ku faşizm di daxwaziya xwe da bi ser neketiye û nekariye ewladên mîrxas ên gelê Kurd dil bigre.

Bimre faşizm û zordesti, bîji Azadi!




BANYO 35 × 50 cm



BOYKOT 35 × 50 cm

Çend nîmûne ji xebata Arîf SEVÎNÇ. Wêneyên wi li Enqerê di raxistîneki da, ji xelkê ra hatin pêşandan û paşê wek broşur hatin çapkirin û belavkirin.



SANSÛR 40 × 60 cm

# HİROŞİMA YEK

Rejima nijadperest ya Saddam qetliamek mezin kîr.  
Leşkerên Iraqê dî 17'ê Adarê da bombên jehrê  
lî ser bajarên Kurdistanê Iraqê DUCAYLA, HELEPÇE,  
HURMAL, İNAP û SIRVA barand.

Diktatoriya Iraqê ya xwinrij, jî 1984'an vîrda bî ser gund û bajarên Kurdistanê da bombeyên bî jehri, çekên kimyevî dîbarîne. Dî 1987 - mehên Nisan, Gulan û İlonê da mîntiqeyên SENF, TABÛN, SARÎN bî bombeyên fosforê hate şewitandî, bî hezaran Kurd hatin kuştin û birindar kîrin.

Dî 17'ê Adara 1988'an da rejima Bexdadê bî gazên kimyevî yê qedexkerî, navçeyên HELEPÇE, DÛCAYLA û HÛRMAL bombebaran kîr, nêzi 5000 jin, zarok, kal û zîlam qetlî kîr û nêzi 7000 jî birindar û seqet kîr.

Dema ku mirov dî televizyon û rojnameyan da wehşeta Helepçeyê, termên jin, zarok û mêran lî kolanan, lî malan û lî zevîyan dîdît; dema ku mirov bî qamyonan kîşandîna termân û lî ser hev komkîrîna wan dîdît, mirov têdîgîhişt ku dî dawîya esra bîstan da xwinrijên ku deh pehin lî Hitler jî dîxîn hene. Ew jî rejima faşîst ya Iraqê ye.

Lî hember qîrkîrîna gelê Kurd bêdengi dom dîke û rejima Baas jî vê bêdengiya cihanê cesaret dîstîne, roj bî roj hejmara Hiroşîmayên nû lî Kurdistanê zêdetîr dîke!..

Mebesta rejima barbar, valakîrîna Kurdistanê û jî holê rakîrîna gelê Kurd e. Jî bo vê armancê jî, hemû gazên kimyevî, wek: Fosfor, sîyonîd, gazên sinîrê, hardal û wd. bî kar tîne û qetlîam lî ser qetlîamê dîke. Ev dewleta rûreş, tu peymanên navnetewî û qaideyên şer guhdarî nake û lî ber çavên hemû cihanê mîrdarîya xwe dîdomîne.

Dema ku bombeya Atomê, Hiroşîma û Nagazakîyê (1945) ser û bînin kîr; bî dehhezaran insan kuşt û seqet kîr, hemû dînya rabû ser piya. Ev roja reş bû rojeki navnetewî ya aşîxwazîyê, roja bêçek kîrîna dîmê. Helbet bî biranîn



û rûreşkîrîna gunehbarên vê qetlîamê tewrek dî cih daye û dîvê bête domandî jî. Lê hewcêye ku lî dij hîroşîmayên dîm jî bête rawestandî. Yê ku biratiya gelan, aşîya dîmê û jî holê rakîrîna şer dîxwazê û piştgîriya vê têkoşînê dîke, dîvê lî dij barbarîya rejîma BAAS jî raweste û rê nede Hiroşîmayên nû. Lewra diktatoriya Saddam, bî xebîtdanîna çekên kimyevî

# NÛ: HELEPÇE!

## 5000 MIRÎ, 7000 BIRÎNDAR



vi li Kurdistanê gelek caran Hiroşimayên nû peyda kiriye. Û ev Nazistiya han li ber çavên hemû cihanê bê paxav (guhnedan) tê domkirin. Serda ji diktatoriya Baas, bî beyanên xwe yên fermi, li pêşberî hemû dîmê, bîkaranina çekên kimyevî dîparêze!.. Koma Miletan, sazûmanên navnetewî, aştxwaz, demokrat û mirovîzên cihanê çî dîkî? Hiç tîştêk berbîçav.

Gelo aştxwazî, demokrati, mirovîzî û wd. ev e? Na, sed caran na...

Gelê Kurd gelek mîrdar û dev bî xwinên weha ditîne û derbas kirîne. Dema ku seg har dibe, pêra ji êrişkar dibe, kef û kunc bî devê wi dîkeve, duranên wi beş dibe. Êdî xuyaye ku rojên seg bî hejmar e û taya mîrîmê pêgirtîye. Xwinrijê Saddam û rejîma wi ji, pê dîzanîna ku êdî rojên wan tînen jîmartîna û hîlweşandîna seltînetîna wan nêz e. Lema ji, har û êrişkar dibe. Lê aqûbeta segê har çibe, ya wi ji ew e.

Ne Saddam ne ji dagîrkerê hemû beşên Kurdistanê, nîkariya gelê Kurd ji rîya azadiya Kurdistan vegekirîna û wi ji holê rakîna. Lewra gelê Kurd evîndarê azadiyê ye û Kurdistan bî xwîna sedhezaran şehîd hatiye avdan. Tu hêzek nîkare gelê Kurd ji vî rêyê vegekirîna.

Qetliama HELEPÇE'yê li gelek welatên Ewropaya û wd. bî xurtî û bî cure cure kiryanan hate protestokirin. Wek, Elmanya Federal, Swêd, Îngiltere, Hollanda, Danîmarka, Yewnanistan, Fransa û hwd. Ji bîlî van karan, li Swêd bî navê "Komîta Helepçe" komîteyek hatiye damezrandîna û postciroyê hesabek alîkariyê hatiye vekirin.

Roj, roja bîlîndkirîna piştgiyîna gelê Kurd e. Îro ji her dem bêtrî berpîrsiyarî dîkeve ser milê pêşverû, demokrat, sosyalîst, aştxwaz û mirovîz. Azadiya Kurdistan wê bî xebatên me û bî cî anîna berpîrsiyarîya me xurttir bibe!

**HELEPÇÊ BÎ TENÊ NEHÊ LE !**



21'ê Adarê dî nav Kurdan da rojêke xwedi qîmet û rûmet e. Jî ber ku ev roja cejna gelê Kurd -Newroz e... Newroz dî folklor û çanda gelê Kurd da xwedi dirrok û kevneşopiyeye kevn e, heta 2600 sali dirêj dibe. Berdewamkirina wê ku evqas sal e tê pirozkirin helbet bê sedem nîne. Dî bîngêhê fikra vê cejnê da, xwe nûkirin û azadi heye. Mana wê çawa lî daxwaza civatê tê, wisa jî lî ya tebietê tê. Jî ber ku lî gor mitolojiya wê, gel lî diji qiraleki zulumkar û xwinxwar şerkirîye û dî roja destpêka bîharê da bî pêşengiya hesinger KAWA serê qiralê zordest (DEHAQ) jê kirîye. Xelkê xwe jî zincirên koletiyê rîzgar kirîye, êdî jî yaneke nû destpêkirîye. Him jî bo gel him jî jî bo tebietê têkiliyeye xurt çêdibe û dî vê roja destpêka bîharê da, şabûna gel û şabûna tebietê xwe dîgihine hev. Zılma qiral Dehaq û zivîstana dirêj û dijwar, serma û qeşa lî paş maye. Rojên xweş, rojên azad û germ destpêkirîye. Lema Newroz bûye nişana têkoşeriyê, xebat û azadiyê û nişana bîharê.

Lî welatê me evqas sal e kevneşopîya Newrozê diji. Lê bî taybetî iro, dema ku gelê me jî bo rîzgariya welatê xwe, jî bo şkandîna zincirên koletiyê şer dîke, grîngî û mana newrozê her sal zêdetir dibe. Jî ber vê yekê ye ku dijmin pirozkirina wê lî gelê me qedexeyê kirîye. Gelê Kurdistanê cejna xwe bî serbestî û lî gor dilê xwe nîkare piroz bîke. Lê jî dijmin ra enyat piroz dîke... Her sal dî 21'ê Adarê da lî ser çiyayên Kurdistanê çirûskên agirê newrozê bîlînd dibe. Sal bî sal geştir û gurtir dibe. Lî her ciyekî ku Kurd lê hene, newroz tê pirozkirin.

Îsal jî lî dervayî welat karker û zehmetkêşên Kurd, Newroz bî şayi pirozkirin. Jî bo pirozkirina Newrozê lî gelek welatên Ewrûpayê, bî taybetî lî Elmanya Federal, bî amadekariya Federasyona Komelên Karkerên Kurdistan (KOMKAR) lî pênc bajarên mezînişahiyan Newrozê çê bûn. Lî van bajarên lî ser hev sêzde hezar (13000) kes dî van şahiyên da beşdar bûn, mîl dan hev û



Newroza xwe bi hevra piroz kîrîn.

Dijmîn dîxwaze ku gelê me zîman, çand û diroka xwe ji bir bike. Çimki he-bûna mîleteki bî van tîştan tê parastin. Newroz ji parçeki çand û diroka gelê Kurd e. Serda ji çandêke şoreşger e, xet û rêçêke xurt e. Ew êdî ji zûva bûye ro-jeke netewî û li dijî kolonyalizmê bûye çêkeke xurt di destê gelê me da. Ji ber vê yekê, pirozkîrîna Newrozê di şerê rîzgariyê da geşkirin û gurrkirîna agirê azadiyê ye. Dijmîn ji vê yekê bîş dizanîm, lema qedexê dikim, nahêlin ku bî serbestî bê pirozkîrîna. Di meha Adarê da hêzên xwe yê eskerî li gund û bajarên Kurdistanê zêdetir dikim. Şev û rojê û dirban kontrol dikim, gir û çiyayên welatê me raçav dikim. Hewl didim ku agirê Newrozê neçirûse. Bî taybetî li Kurdistanê Tirkîyê ev tedbirên eskerî qewitîm. Tîrsa dewleta Tirk ew e ku ev çirûskên Newrozê (yên şerê azadiyê) dikarin şewatên mezin dadim.

Lê ev tedbirên dijîm, nîkare pêşiyê li pirozkîrîna Newrozê û azadbûna gelê

me bigire. Bî çavtîrsandinê, bî zulmê û bî qetliaman ew sernakeve. Gelê Kurd ji bo şikandina zincirên koletiyê biryara xwe daye. Zû an dereng serfirazi ya gelê me ye.

Îro li hemû parçeyên Kurdistanê, li dijî kolonyalîstan têkoşin bî xurtî berdewam dike. Gelê Kurd ji bo şikandina zincirên koletiyê bî mîrxasî bî fedakariyên mezin şer dike.

Li hember pêşketina têkoşina rîzgarîyê dijîmî xwînxwartir û hovtir dibê. Rejîma Iraqê ya faşîst û kolonyalîst îsal di meha Newrozê da bî bombeyên gaz êrişî gelê me kir, di carekî da 5000 Kurd kuşt, qasî 7000 kes ji birindar kir. Ev, ne cara pêşîn e ne ji wê cara dawîn be, heta nîha gelê me gelek qetliamên mezin dit, lê daxwaza azadiyê berneda her çû agirê azadiyê geştir kir. Ji vir şunda jî, şerê azadiyê wê nesekine, ta ku gelê me welatê xwe jî bî destê kolonyalîstan rîzgar bike.

**BIJÎ NEWROZ!**

**BIMRE KOLONYALİZM!**

## KINCÊN SPORÊ YÊN SÊ-RENG

### 1

#### VAZGAL

(Lî pey 12 Îlonê 1980, lî bajarê Diyarbekrê lî taxa Baxlera, lî oda maleki. Dî destê Omer da belavokek tî talda odê dixwine. Pîştî qaseki ji derva hun dangan dibihize, yek zorê dîde deri ku vebike. Omer bî lez dî cîda radibe ji bo veşartîna belavokê lî nava odê ciheki veşartî-nê digere, çav bî sandalye dikeve, belavokê wek lûle dipêçe û dixwe nav piyê sandalye yê qulkîri. Diya wi ji sûkê ji alvêrê tê, dengê wê nasdîke, reng û rûçikê wi tê ci).

**DAYİK** : Omer deri veke, lawo ez diya te me! (Omer diçe deri lî dayîka xwe vedîke)

**DAYİK** : Te çîma deri kilit kîriye? Ma tu ji hinekan dîtîrsî?

**OMER** : Na, yadê ezê ji kê bitîrsîm, bî xeleti mîn deri gîrtîye. (Lî kîsa destê diya xwe ya kêmdagîrtî dînhêre)

**DAYİK** : Yadê te tu tîşt nekîriye.  
: Her tîşt ewqas buhayê ku ez re-bena xwedê çî bîstînim lawo.

**OMER** : Vê buhatiyê pîştî me feqîra şî-kandîye. Bî aqlê te dawîya vi işî wê çawa bê yadê can?

**DAYİK** : (Bî hêrs) Disa mîna yê dîm te qîsekîr.

**OMER** : (Bî dengêki nerm) Baş e, êdî qî-se nakîm. (Bêdengî Omer, saqo-yê xwe hîldîde) Ezê herîm ber deriyê karxana Şayaqê, paşê ezê tev kekê xwe werîm, de bî

xatîrê te yadê. (Paşê deri vedî-ke û ji mal derdîkeve. Diya wi ji, ji bo amadekîrîna şivê dest bî xebatê dîke. Pivaz, kartol tî-ne, hûr dîke, çend deqqe paşê kurê karkerê Şayaqê Nerîman, lî pey ji Nerîman bîxwe dikevi-ne mala wana)

**ZAROK** : Xatîya Seyrê tu çî dîkî?

**DAYİK** : Kuro Elo çîka were, iro tu re-het bîsekîni ezê şekîr bîdîme te. (Dîzvîre ser Nerîmanê) Were xwîşkê, were lexzek lî ba mîn rûnê.

**NERÎMAN** : Saxbî Seyrê, dîvê bîçîme kar, derengî bîmînim wê seyê Şaya-qê qîyametê bîqetînim. Qusûra mîn mêze neke, êdî tu kesên mîn nemane. Yê hene gîrtî ne, yê hene qaçax in, yê hene ji qaşo giravî bo me çûne çûne karê. (Paşê dengê xwe piçek nîzm dîke) Te ji bîhist, duh bî şev disa avîtîne ser taxa Şehî-dan, gelek xort gîrtîne bîrîne. Esanek hebû, ne tu ji nasdîkî? (Rûyê Seyrê dînhêre ku çîka tê bîra wê an na, Seyrê ji serê xwe dîhejîne, "erê ez ji nasdî-kîm") Ew ji hîldane bîrîne, he-valê kurê mîn ê mezîm bû. (Bê dengî)

**DAYİK** : Keçê dibe ku işev ji bavêjine ser Baxlêra? Cara dîm ji usa kîrîm, ne wîlo ye?

**NERİMAN** : *(Serê xwe wek erê dihejine)* Evana lap harbûne, bî vê qaydê wê heta kê derê herîm Seyrê? Bî girtîna xort û keçan, bî kuştîne welle ewana nîkarîm, haşa jî te, tu rêxî bîxwîm. *(Bî desthejandîne "Xwedê bela xwe bîde we")* Dereng e êdî ez dîçîm, xatîrê te...

*(Dû çûyîna Nerimanê, Seyrê dîkeve nav mîtala, dîfîkîre, şuxlê destê xwe datîne erdê, aliyê temaşevana dînhêre. Elo dest davêje bîşkoka radyoyê da belavoka hukmê leşkerî ya faşîst tê xwendîm. "Sîkîyönetîm komutanlığıнын 15 numaralı bildirîsidir. İş ve okul hayatını felce uğratanları yakalayıp cezalandırmak; kardeş kavgasının önüne geçmek ve ülkenin bölünmesini önlemek için şanlı Türk ordusu yönetime el koymuştur. Türk milletinin birlik ve refah içinde bir hayat geçirmesi yegane dileğimizdir. Bunun için bölücü ve anarşistlere karşı yürüttüğümüz savaşta tüm vatandaşların bizlere yardım edeceğine inanıyoruz. Vatan hainlerini bize haber veriniz. Kesin olarak isminiz saklı tutulacaktır..."*

*(Elo bî meraq tê ba Seyrê)*

**ELO** : Xatîya Seyrê çî bû? Dibe ku eskerê Romê kekê Omer jî hîldan bîrîm. *(Seyrê destê xwe wek "nîzanîm" dihejîne. Elo jî derdîkeve dîçe)*

*(Lî koşekî odê bî bê dengî wek pandomîma êşkencekîrîna xortekî wê were nişandan)*

*(Omer wek bîrûsk dîkeve malê, Seyrê jî cîh dîpeke, Omer rast berê xwe dîde cîhê belavoka veşartî, piyê sandalyê radîke, belavokê derdîxîne, Seyrê lê dîqîre)*

**DAYİK** : Mîm çend caran jî te ra got teví van şîxulan mebe. Hûn nîkarîm bî hukumetê ra serederiyê bî-

kîm, nanihêrî her roj dîgrîm, êşkence dîkîm, dîkujîm... Tu dê belayekî bîni ber deriyê me...

**OMER** : Metîrse, tu tîşt nabe..  
**DAYİK** : Zû wana bîde mîm. Ez bîdîrînim. Na, naa, bîde mîm ez bîşewîtinîm. *(Dest davêje ku kaxîzê destê kurê xwe bîstîne, lê Omer nadê)*

**OMER** : Yadê tu xemê nekîşîne, a nuha ezê vî kaxîzî jî mal derxînim, bîdîme yekî dîm. Dî vî kaxîzî da tîştên ku anîne serê kurê xwişkî Nerîman û kurdên dîm, hatîye nîvisandîm, lazîme hemû Dîyarbekîr evê yekê bîzanîbe. *(Omer pîrtînek bêhnî xwe dîstîne)* Deynê stûyê me hemûyan e ku em alîkarîya wana bîkîm, ne wîlo ye?

**DAYİK** : Peh... hela werîm lî vî bînhêrîm, bî vî kaxîzê hanê wê alîkarîya gîrtîyan bîke! *(Paşê wek nesîhet)* Lawo tu teví van karan mebe, çî zora te heye dîkeví nav vî şîxulî, ahan em çawa xweş idara xwe dîkîm, şîkîr hewcedarîya me jî tu kesî nîne.

**OMER** : Tu jî vî hali ra idara xweş dîbêjî? Zîkê me têr nabe, kînc û libasên me ê herî teze 5 - 6 salî ne. Serda jî hovîtî û neheqîya van Tîrkan, ox! çî jîyanek xweş...

**DAYİK** : Usa nebêje, kes hene halê wan jî vî hali xîrabtîr mî.

**OMER** : Yadê mîm mekteba lîsê qedand, kar tune ye. Kekê mîm lî karxana Şayaqê çî qezenç dîke? Jî belengazî nîkare idara xwe bîke, ma bîzewîce... Lî xwişkî mîm Eysê bînhêre, ew çî pere dîstîne jî otêlê? Qet, sibê heta êvarê qehr û derdê wana dîkîşîne.

**DAYİK** : Bîla be, tu dengê xwe meke, nekeve nav van îşan. Lî vî welatî tenê tu mayî?

**OMER** : Ez dengê xwe nekîm, tu teví van şîxulan nebí, ewê dîm lî hember neheqîyê bêdeng bîmîne, tîştên hîm xîrab û ecêb wê werîm serên me hemûyan. *(Des-*

- DAYİK** : *tê xwe ji, ji aliyek va dihejine*  
: Te lap kışandiyê bavê xwe, ew ji tîk û tenê li hember axa sekîni, binhêre çî hate serê me... Usa nekîra halê me li gund hin çêtir bû.
- OMER** : Ne wîlo ye yadê! dema axa tiraktor sitand êdî kar bo me gundiyan nema, bavê min ji berî herkesî dewa heqê xwe kir, axa pêşiyê ji ji bavê min destpêkir paşê gundiyan dîn ji ji gund qewirand.  
*(Omer bî bêdengi belavokê dirandi aliyekî va dike nav qutiya kurgutê, gav davêje ku derkeve derva, ji kuçê deng tê)*
- D.DERVA** : De lez bike Omer, em bona sporê dereng diminin.
- OMER** : Ku ez derengi mam nekeve ta-têla min yadê. Îro em disa dîçî-ne hol listinê. *(Omer derdikeve, Seyrê êdî xwe şaşkiriye, nîzane ku çî bike. Li nav odê diçe tê, derdikeve derva, ji xavka hin tiştan digere. Lê kuşê hûr û dûr difikire, Elo dikeve odê.)*
- ELO** : Xatiya Seyrê!
- DAYİK** : Çiye kuro!
- ELO** : Kekê Omer ji wek kekê min şoreşger e? *(Mina mirovê mezîn)* Ez ji şoreşger im, ez mezîn bibim, ezê heyfa kekê xwe ji wana bîstînim.
- DAYİK** : Hela li vi êtimi mêzebîkîm, bî-hustek bejn heyê çî qîsse dike. *(Bî hêrs çî nişan dîde û dibêje)*  
Dengê xwe neke, were rûnê.

- (Seyrê bî xwe xwe xeber dîde)*  
Ev keçîka han li kêderê ma? Ewqas derengi nedîma. *(Elo, li dest tebanceyek derewîn, destpêdike dilize, li derdorên gulle dibarîne, diçe ber pencerê û li derva dînhêre, paşê li pişt derî xwe vedîşêre. Derî vedibe Eysê dikeve hundir)*
- ELO** : Eller yukarî pis Kurd! *(Eysê destê xwe bî rasti bilind dike, çenta destê wê dikeve erdê, ew lexze fehmdike ku ew Elo ye, paşda dizvire şemaqek li Elo dixê, piştra radîmûse pê şadibe)*
- EYŞÊ** : Wek polêzê Tîrkan te min tîrsand.
- ELO** : Kekê minê Kamul ji wîlo gurtîm bîrîm. Eysê ewana mirovên ne baş in ne wîlo ye?
- EYŞÊ** : Helbet, ewana dijminê me belengazan û Kurdan in.
- DAYİK** : Keçê Eysê ewqas bî vi ra we qîsse kîriye, ew ji bûye qomînist *(Bî hêrs)* Heta nuha tu li kêderê mayî Eysê? *(Eysê li aliyê Elo dizvire)*
- EYŞÊ** : De tu here derva bî hevalên xwe ra bîleyize. *(Elo ji, ji odê derdikeve)* Yadê ezê li kêderê bîminim? Wîra otêl e, bî hezaran derd û kul hene, tu xîlas ji nabîm. *(Axaftîna xwe dibire, çenta xwe datîne, gêziyê hildîde dest xwe ji aliyek malê dimale ji aliyekî va ji dipeyive)*  
*(Dumahik heyê)*

## LİSTİKA ÇEVGAN

Evliya ÇELEBİ

Wergir: DILSOZ

Listika Çevgan ew e ku li seriyekî vê meydanê ji kevirê granît stûnek heyê û li seriyê dîn stûneke dirêjî dîn hatiye kutandî. Li her aliyekî hezar sîwar dîcîvî û dî destê wan da ji darê guvîjê gopal, ji Çevganê ra amade dibîm.

Li vê meydana listikê bî qasî serê insanekî topeke darîndî. Ji aliyekî va heştê-heşt kom têtê danî û bî dengî bilînd banga destpêkirîna listikê têtê kîrî; ji her aliyekî mirovek bî sîwarî xwe berî meydanê dîdî û bî çevganî



Li topê dixin ku topê ji xeta stûna ali xwe derbaskin. Yeki dîn ji bî hespê, xwe xwari ser topa ku gêr dibe dîke û çevganeki lê dixe, ku topê bibe berbî stûna ali xwe va. Bî vi awayi yek bi yek dîkevin listikê û li topa ku bî hewa dîkeve dixin. Eskerên herdu aliyan wisa çevganên li topa feqir dixin ku gelek jê pare- pare dîbin heta ku ji xelkê herdu aliyan yek jê biser dîkeve, topê dîbin sinorê xwe û piştî listikê aliye binketi ji aliye biserketi ra ziyafetên giran radixin.

Temaşe û pehlewaniyeke ecêb e. Dî dawiya vê listikê da armanc, hunerên sıwariya hespan e. Lê piyê gelek hespan bî derbê çevganên xurde dibe yan ji hespên kehêl kulek dîbin. Lê hespên feqir wisa talimbûyi ne ku pîsik çawa çavnêriya mişk dîke hespên çevganê ji wisa çavnêriya topê dîkin.

Rasti ev e ku, pehlewaniyeke mezin e. Lê gelek caran ji bo vê topa han şerên giran bûne û pîr xwin hatiye rêtin. Axir, bî qewl dileyizin. Mesela li ser


qewl, ku ji herdu aliyan yek jê pênc car yan ji deh car (topê) bibe sinorê xwe, meydan ji wan ra dimine û aliye binketi ziyafetê radixe. Li seranserê Kurdistan û Ecemistanê (Îran) çeknasi ev e.

Lê mirovên şerietê rê nadin listika çevganê, heta tu bêji qedexa ye. Dema ku li deştê Kerbelayê Hz. Îmamê Huseyin şehid dibe, serê wi û bî hezaran şehidên Kerbelayê li Şamê tînin ber Yezidê bi-mezid, Yezid ji hemamê dertê, li hespê xwe sıwar dibe û bî çevgana destê xwe li serê Îmam Husayin dixe û bî ser hev ra gêr dîke.

Dî vê meydana çevganê da ji dara çam stûnek heye ku berbî ezman dirêj dibe. Li ser titaleka darê tasek ziv heye. Hemû çeknasên Kurd heta bîniya vê stûnê hespên xwe dajon, bî qasi şêst qevd tir, tûj dîkin û berdîdî tasê, ki li tasê xe ji Xan, vê tase ziv distine. Ev ji temaşeyek e.

(GERNAME, Euliya Çelebi -  
Cild 4, Rûpel: 122, 123)

## GABRIEL GARCIA MARQUEZ 1928—



*Gabriel Garcia Marques dî sala 1928'an da dî nav malbateke xızan da, li gundê Aracataca, li bakûrê Colombiayê hatiye dinê û dî 18 saliya xwe da dest bî xebata rojnamevaniyê kiriye. Garcia Marques sala 1954'an li Romê (Paytextê Îtalya) bû nûçegihanê rojnama liberal "El Espectador", ya ku piştra ji aliyê diktatoriya leşkeri hate qedexekirin. Paşê ew welat bî welat ciguhasti bû. Çend salên dawiyê wek multeciyeke siyasi jiyana xwe bêtr li Îspanya û Meksikayê derbas kir. Piştî wergirtina xelata Nobelê ya sala 1982'an, destûr danê ku vegere welatê xwe.*

*Dî nav niviskar û edibên Amerika Latini da tukes qasi wi nehatiye xwendin. Xasma bî inglizi û ispanyoli berhemên wi bî milyonan gihîştine destê xwendevanan.*

*Gabriel Garcia Marques niviskareki pêşverû û realist e. Dî roman û serpêhatiyên wi da jiyana gelên Amerika Latini, hevriki û dîjariyên civaki bî hostati tên şirovekirin.*

*Berhema wi ya pêşin dî sala 1954'an da derket. Dûra gelek roman û serpêhatiyên wi hatin weşandin. Lê pêşkevî û serfrazîya wi ya huneri dî sala 1967'an da bî romana "Cien años de soledad" xwe nişan da.*

*Me serpêhatiyêke wi wergerande kurdi û li jêrê pêşkêşî xwendevanan dikin.*

# Veznivroya Sêşemê

*Wergerandin Ji Swêdi: X. LEZGİN*

Trên ji nav kaşên zinaran, dî buhureki teng ra derbas bû, derkete deştê û dî nav rezên mûzan ra, yên ku simetrik û bêdawi dirêj dibûn û diçûn, bî lez dikişiya. Hingê êdi hewa ji bî tên bû û bayê deryayê ji êdi xwe nedîda hisandin. Dî pencerê ra dîyeki reş kete hundur û kompartîman dagirt. Li rexên rîya trêne, riyên gundan yên ji axê û teng paralel dirêj dibûn û diçûn. Li ser van rêyan erebeyên ga hebûn; bî koçanên mûzan yên hêşin (xav) barkiri bûn. Li aliyê rê ê din, dî nav darên palmiye û dirîkên gulên da, carna xaniyên ofêse yên bî ventilator; barakên kêremêt, koşkinê li eywanên wan mase û sandaliyeyên sîpi ber çavê

mîrov dîketin. Saet yazdehê pêşnivro bû û germa nivro hin destpê nekiribû.

— Çêtir e ku tu pencerê bigri, jînikê got. Nava porê te wê tîji teni be.

Keçikê xwest pencerê bîkşine jor lê pencerera zengari dî ciyê xwe da hişk asê bûbû.

Ew tîk û tenê bûn dî vê vagona basit ya sînifa sêyem da. Jî ber ku dîyê lokomotîfê hê ji dî pencerê ra dihatê hundur, keçik rabû ciyê xwe guhast, û eşyayê xwe dani şûna xwe ku dî vê rêwingiyê da hemû barê wan ew bû: Torbeka naylon erzaqê wan têda û qevdek gul dî nav

kaxez da pêçandi. Lı ser bındera aliyê dın, ji pencerê hıneki dūr û lı hember diya xwe rûnişt. Lı ser herdukan ji kincên şinê (hezni) hebûn.

Keçik duwazdeh sali bû û ev cara pêşin bû lı trêne sıwar bûbû. Jınik ewçend pir xuya dı-kır ku mirov texmin nedikir ew diya keçikê be. Wısa diyar dıbü; ji tamarên ser qapaxên çavan, gewdê wê yê biçûk, nermiki û bê biçim dı nav wan kincên reş da ku wek qapûteki keşan xuya dıkir. Wê pala xwe hışk sıpartıbü diwarê pişt xwe û bı herdu destan çenteki çerm ê qırêj dı nav ranên xwe da pit girtıbü. Wek pıraniya mirovên tengezar û bêçare, ew ji wısa bêhnfire û ittiatkar bû.

Saet duwazdehê nivro germê destpê kır. Trêne deh deqıqan lı istasyoneke ku kes lê tunebû rawestiya, ji bo ku ava wê dagrın. Diyar dıbü ku lı derva, dı wê bêdengiya esrarengiz ya baxçan da, siya daran paqij û zelal bû. Lê dı hundurê vagonê da bêhneke nexoş hebû. Trêne êdi leza xwe zêde nedikir. Lı du bajarên biçûk sekını. Herdu bajar geleki dışovine hevdu, bı wan xaniyên xwe yên texte ku bı rengên jindar hatıbüne boyaxkırın. Jınikê stüyê xwe xûz kır û dı xew da çû. Keçikê solên xwe derxıst. Paşê çû avdêxanê û gulên xwe yên ku êdi dıçırmısın xıste nav avê.

Dema ew paşda vejeriya şuna xwe, diya wê lı benda wê bû, ji ber ku wê xwarına xwe bıxwarana. Jı torbê naylon parçek penır û niv koçan mısır û parçek nanê hışk dirêji keçikê kır û para xwe ji ewqas girt. Dema wan xwarına xwe dıxwar, trêne geleki hêdi dı ser preke hesın ra kışiya û dūra ji bajareki sêyemin derbas bû. Ev bajarê han ji mına wan herdu bajarên dın bû, lê lı meydana wê xelk hebû. Komeke sazbanda dı bın wê kele-kela tavê da straneke şayıyê dıstıran. Lı aliyê dın ê bajêr, dawıya rêzên mûza hat û çoleke zuha û hışk destpê kır.

Jınikê xwarına xwe xılaşkırıbü.

— *Solên xwe lı xwe ke, got.*

Keçikê dı pencerê ra dınhêri. Lê ji wê çola rût û bêdawi bêtır tışteki dın nedıdit. Lı deştê, trêne leza xwe zêdetır kır. Keçikê parçê dawiyê yê wi nanê hışk dısa xıste torbe û bı lez solên xwe kire pê. Jınikê şeyek dirêji wê kır.

— *Porê xwe şeke, got.*

Dema keçikê porê xwe şe kır, trêne ji destbı fitandinê kır. Jınikê stüyê xwe ji xwidanê zuha kır, bı tiliyên xwe dılopên xwidanê ji eniya xwe dawêşand. Dema ku êdi keçikê porê xwe şe kırıbü, trêne ji malên pêşin ên bajareki nû derbasbû. Ev bajar hıneki mezıntır bû ji bajarên derbasbüyi, lê belê ew ji wan ji nexoştir bû.

— *Eger dıxwazi tışteki bıki nıha bıke, jınikê got. Paşê mıze-mız neki, tu ji tına helak bıbi ji tışteki vexwarınê tune.*

Keçikê bı serhejandinê erê got. Dı pencerê ra bayeki zuha û pır germ kete hundur, û ew ba bı dengê fitandına trêne û teqe-reqa vagonên salbuhuri tevlihev dıbü. Jınikê torbe bı bermaya xwarınê va lı hev pêça û kire hundurê çente. Hingê dı pencerê ra ew bajarê mezın xuya kır. Dı vê roja Tebaxê da keçikê gulên xwe dı nav kaxezê rojnameya şılbüyi da pêça, ji ber pencerê piçeki dırket, pêşda hat û bı meraq lı diya xwe nihêri. Hingê diya wê wek bersiv awıreki germ û rûken da qıza xwe. Trêne fitandına xwe bıri û leza xwe kêm kır. Lehzeke şında sekını.

Lı istasyonê qet kesek tunebû. Lı aliyê kolanê ê dın, peyarê seranser ketıbü bın siya darê palmiyê, tenê saloneke bilardoyê vekiri bû. Bajar dı bın germa rojê da dısmıcri. Jınik û keçik ji trêne daketın û ji wê peronga vık û vala derbasi aliyê dın bın, lı ser peyarê xwe avêtın bın siyê.

Saet hema-hema dudo bû. Dı van saetên nivro da bajar dıkeve xewa navrojêkê. Dıkan, daireyên resmı, dıbıstan gışt tın gırtın, lema ji saet yazdehan pêda hetani çarikek beri saet çaran venebın, hingê êdi trêne ji paşda vejeriya, ji kuderê hatıbü wêda çû. Wê gavê tenê otêla lı hemberê istasyonê û dı bınê wê da salona bilardoyê, yek ji postexana kêleka meydana vekiri bın. Dı xaniyan da, ku pıraniya wan bı modela şirketa mûzan hatıbın avakırın, deri ji hundur va dadayi bın û perde kışandi bın. Ev xaniyana ewqas germ bın ku xelkê fıravına xwe lı derva dı hewşan da dıxwarın. Hınekan ji yek sandaliye dıdane ber diwar, lı bın siya darên palmiyê veznivroya xwe lı der va derbas dıkırın.

Wextê ku çüne nav bajêr, xwe lı ber siya darên palmiyê gırtın jınik û keçikê, bî ku veznivroyê lı xelkê bêtam bıkın. Paşê raste-rast berê xwe dane mala Keşe. Jınikê bı neynikên xwe caxa deri ya pola pencerü kır, hıneki sekı-

ni paşê disa manevra dubare kîr. Ji hundur dengê vantilatorê dihat. Dengê wan gavên ku nêzîki deri dibûn qet nedihate bihistin. Dema rîzda deri rabû, çîngineke pîr hmdîk jê hat.

Deri piçeki ji hev vebû û dengêki pîrsî: "Ki ye ew"? Jîmkê hewl dîda ku di nav caxa pola ra li hundur binhêre.

— *Ez dixwazim bi Keşe ra bipeywm, jîmkê got.*

— *Ew niha radizê.*

— *Geleki grîng e, jîmkê enyat kîr.*

Dî dengê wê da dijderketîneke sakîn hebû.

Jîneke bi salên xwe gihiştî, hîneki qelew, reng û rûçîkê wê zer, porê wê gewr wek hesin, hêdîka deri vekîr. Çavên wê di pişt berçavkên stûr da geleki biçûk dixwiya.

— *Were hundur, got û deri vê carê vekîr.*

Ketîne odeki ku bi bîna gulên kevîn dagirtî bû. Berdestiya malê qenapeke kevîn nişani wan da, ji bo ku li ser rûnên. Keçîk rûnişt, lê diya wê jîpê sekîni bû, dîramî, bi herdu destan hûşk bi çentê xwe girtîbû. Ode pîr bêdeng bû, bilî dengê vantilatorê tu dengêki dîm nedihate bihistin.

Berdesti, li serê odê aliyê dîm ji deri da ke te hundur.

— *Rîca dîke ku hûn piştî saet sîsiyan werin, jîmkê bi dengêki geleki nîzîm got. Ew berî pênc deqîqan çû rakeve.*

— *Trên saet çaran da diçe, jîmkê got.*

Ev bersiv geleki kurt û bi bîryar bû, lê dengê wê hê jî nerm û dostane bû. Ew yekem car bû ku berdestiyê hîneki pêra rûkenî nişanda.

— *Aha îşê we ewqas ecele ye? berdestiyê got.*

Demalî serê odê aliyê dîm deri disa hate girtin, jîmkê li kêleka qîza xwe rûnişt. Ev oda bendemayîne a biçûk, odeke xîzan bû, lê geleki paqîj û xweş bû. Li aliyê dîmê sewkiyê ku odê navbîr kirîbû û di ortê da kirîbû du beş, maseke xebatê ya basît hebû. Li ser masê pêştemaleke muşambe raxîstî bû û daktiloyeke kevîn û li kêleka wê jî di vazoyeki da gulên kevîn hebû. Di paş wê da arşîva qeydên nîfûsê. Diyar dibû ku jîneke nemêrkîrî baş li vê nîvisxanê mêze dikîr.

Deri disa vebû û vê carê yê ku ji deri da ke te hundur Keşe bi xwe bû, berçavkên xwe bi desmalê paqîj dikîr. Dema wi berçavk dane ber çavên xwe ancax wê çaxê mirov pêderdî-

xîst ku ew bîrayê jîmkê ye, ya ku deri li wan vekîrîbû.

— *Ez çî xîzmetê dikarim ji we ra bîkîm? Wi pîrsî.*

— *Kîlîten deriyê gorîstanê, jîmkê got.*

Keçîk, gul li ser çokan, li ser qenapê rûniştîbû. Piyên xwe di ser hevra derbas kirîbû û kirîbû bin qenapê. Keşe li wê nihêrî, paşê li jîmkê û dawiyê di nav caxên pencerê yên pola ra li derva, li ezmanên bê hewr nihêrî.

— *Ma di vê germê da?... Wi got. We dikarîbû xwe bigirta hetanî roj diçû ava.*

Jîmkê serê xwe hejand û tu tiştêk negot. Keşe derbasî aliyê dîm ê sekîyê bû, deftereke cildkîrî, pênivîs û rengdangek ji dolabê derxîst û li ber masê rûnişt. Porê wi gîjîki bû, lê destên wi her dilvîyan.

— *Hûn dê mezêlê kê ziyaret bîkîm? wi pîrsî.*

— *Carlos Centenos, jîmkê got.*

Keşe hê jî fehm nekîrîbû.

— *Ew dizê ku hefteya çûyî li vîra hate kuştin, jîmkê bersiv da, hê jî dengê wê li ser tona berê bû. Ez diya wi me.*

Keşe weha jîmkê raçavkîr. Lê jîmkê jî, dêna wê tîm li Keşe bû, çavê xwe ji wi nedîqetand. Ser vê yekê Keşe hîneki soro-moro bû. Serê xwe berjêr kîr. Dema wi daxwazname dadîgirt ji jîmkê hîm tişt dîpîrsîn. Wê jî bê dudilî û bi hurgîlî bersiv dîda. Gotînen xwe welê li dû hev û rêk û pêk rêz dikîr, mirov digot qey ji kaxezeki nîvisandi dixwîne. Keçîkê bendê sola çepê vekîr, paniya xwe heta nivî ji solê derxîst. Paşê piyê rastê jî wîsa kîr.

Çîroka vê bûyerê, hefteya çûyî roja duşemê saet sîsê şevê da, li ciyekî ji wir çend taxan dîr destpê kîr. Bi navê Senora Rebeca jî-nebiyek tevî hînek pîl-pîrtên xwe yên nehêja, di xaniyekî da tenê bi serê xwe dîjiya, bi dengê baraneke sîvîk ra dibîhîse ku çawa yek li derê derva dixebite ku bikeve hundur. Jîmkê radîbe, vîrda-wêda destê xwe li hundurê dolabê digîrine heta ku şeşegîreke kevîreke dibîne ku ji dewrana serbaz (subay) Auerlino Buendias heta roja iro tu kesî pê gullek neteqandîbû. Jîmkê radîbe, bêî ku lampê vêxe diçe sîvderê. Piştî dengê rîzda deri, tîrseke bêhempa dîkeve nav hînavê wê, lema piyên wê li hev dialîm, nîkare rîya deriyê ku deng jê hatîbû bibîne. Ji xwe ew 28 salên jîyana bi tenê di xanîkî da, tîrsek li ba wê peyda kirîbû. Ew şeşegîrê bi

herdu destan hıldide, çavên xwe dıgre û gul-leki diteqine. Pışti teqinê, bılı xuşina baranê, ku lı sacê serbanê dıket, tu dengekı dın nedı-bıhist. Paşê şingina hesineki hat ji ser bêtona peyarê û yeki bı dengekı nızım û geleki westi-yayi "Ax dayê" got. Ev merivê ku dı berban-ga sıbê da lı pêşberı xani laşê wi hat ditın, hestiyê dıfınê şıkestı bû, kıraseki dameki û pantoloneki rojane lê, dı şına kemberê da doxinek lı pıştê girêdayı û pêxwas bû. Lı ba-jêr hiç keseki ew nas nedikir.

— *Ango navê wi Carlos Centano ye, Keşe dı ber xwe da mınmını, dema nıvisandın qedand.*

— *Centano Ayana, jınikê got. Kureki yekane bû.*

Keşe vejeriya ber dolabê, ji aliyê hundur bı deriyê dolabê va çend kilitên zengari dı bızmareki da elıqandı bûn, evana her ewreng kilit bûn ku keçikê ji mêj da texmin û xeyal kırıbû. Diya wê ji dı zaroktiya xwe da wısa texmin kırıbû. Hetta wexteki Keşe ji, kilitên cınnetê yên bı vi dirûvi dı hişê xwe da peyda kırıbû. Wi ew anin danin ser deftera serdanê (ziyaretê) ku lı ser sekiyê ji hev vekırı bû, û bı tiliya nişandanê cihek nişan da û pêra ji lı jınikê nihêri.

— *Aha lı vir bıvıvise.*

Dema jınikê navê xwe xêzıkand, ji aliyeki va ji dı bıncengê da hişk bı çentê xwe girtıbû. Keçikê gulên xwe hılda, solên xwe bı serê pozê piyê xwe bı erdê ra kışand û çû ber sekiyê, bı balkêşi lı diya xwe dınihêri.

Keşe nefeseke kûr kışande cigeran û berda.

— *Hiç we hewl neda ku hûn wi binine ser riya rast?*

Jınikê pênvıvıs xıste rengdangê û bersiv da.

— *Mıroveki qenc bû.*

Keşe pêşiyê lı dê, paşê lı keçikê nihêri û çı ecêb e ku hiç jelogrı nin bûn ew. Jınikê her bı wê tonê dom kır:

— *Mın jêra got ku hiç wexteki ji derê keseki xwarınê nedize û wi bı gurra (bı gotına) mın dıkir. Lê zemanê ku wi boksortı dıkir, carna bı rojan jihevketi, perişan dı nav nıvinan da dıma.*

— *Bêçare hemû dıranên xwe kışand, keçik ji tevi qısedanê bû.*

— *Erê, jınikê tesdıq kır. Wê çaxê mın qet lezzetek nedıt, pari dı qırka mın da ji nedıçû*

*xwar, ku êvarên şembiyan wi ji ber lêdanê nıkarıbû şiv bıxwara.*

— *İşê Xwedê mırov nızane, Keşe got.*

Lê ew bı xwe ji bı vê gotına xwe zêde bawer nedıxwiya, hıneki ji ber ku serhatiyên jıyanê ev şık dabû wi, hıneki ji ji ber ku ode zehf germ bû. Dı vê navberê da Keşe pêwıst dit ku bı bira wan bine ku ew serê xwe ji tav-lêxıstınê bıparêzın. Jı aliyeki va ji wan ra şırove dıkir ka wê çawa mezelê Carlos Centanos bıbinın, ji aliyeki ji bawışkên xewê dıhatınê mına ku êdı amade bû bıkeve xewê. Dı vejerê da ne hewce bû ku lı deri xıstana. Dıkarıbûn kilit danına bıne deri û eger bıkarıbûna ji dêrê ra yadigarek ji danına ber dergeh. Jınikê bı balkêşi guhdariya wan şırovekırama kır, lê bı spasiyêke bêken xatırê xwe jê xwest.

Hê wi deriyê derva venekırıbû, dit ku çend kes lı derva sekinıbûn, wısa xwe nêzik kutabû-ne caxa pencerê wek ku pozê wan bı hesın va pahn bûbû. Komek zarok bûn. Dema deri vebû zarok ji hev belav bûn. Normal wexteki dın dı vê saetê da kes lı derva nedıgeriya. Xelk dı bınsiya darên palmiyê da, bı komikên bıçûk lı hev cıviyabûn. Keşe lı wê kolana ku ji ber germa tavê leylan jê radıbû nihêri û fam kır. Hêdika deri girt.

— *Qasek bısekıne, wi got bêı ku lı jınikê bı-nihêre.*

Xwişka wi ji deriyê aliyê dın derket, cakê-teki reş dı ser şevkırasê xwe da lı xwe kırıbû û keziyên wê ser milê wê da berdayı bûn. Hıneki bêdeng lı Keşe nihêri û paşê:

— *Xelk dızane, wê dı ber xıwe da mınmınand.*

— *Çêtır e ku hûn dı deriyê paşiyê ra derkevın, Keşe got.*

— *Wek hev e, xwişka wi got. Xelk lı ber hemû penceran kom bûne.*

Wısa diyar bû ku heta wê gavê jınik teneghiştıbû. Hewl da ku dı nav caxê pencerê ra lı derva lı kolanê bınihêre. Paşê gulên destê keçikê gurt û berbı deri meşiya. Keçik lı dı wê çû.

— *Raweste hetani roj çû ava, Keşe got.*

— *Hûn dê çawa bıkarıbın dı vê germê da herın. Bısekinın ez ji we ra sıwaneki bınim, paşê disa lı mın vejerının.*

— *Spas, jınikê got, tışt nabe ne hewce ye.*

Bı destê keçikê girt û derkete kolanê. □



## bı aramê tigran ra hevpeyvin

*Hevpeyvin ji aliyê "Dengê KOMKAR" ve hatiye çekirin. Ji ber ku DK wê bi turki diweşîne, em ji kurdiya wê pêşkêşî xwendevanên xwe dikin.*

*Ji kerema xwe ra tu dikari bi kurti behsa jiyana xwe ji me ra biki?*

**A.TİGRAN:** Bavê min xelkê Sasonê, diya min ji xelkê Farqinê ye, ji ber teda û zilma Tırkan dê û bavê min li sala 1932'an da revine hatine Sûriyê. Li Sûriyê em bi çandniyê va mijûl bûne. Pırani em di erdê xelkê da dixebitin û me idara xwe dikir.

Ez di sala 1934'an da li bajarê Qamişliyê ji diya xwe bûme. Em çar bira du xwişk in. Li Sûriyê min heta sîmfa şeşan xwend. Du sal bi zimanê Erebi ên din ji min bi zimanê Ermeni xwend.

Dê û bavê min her tim li nav malê bi Kurdi qisedikirin, lê bi zarokan ra bi Ermeniki xebirdan. Hemû cınar, dost Kurd bûn. Bi vi teheri ez kurdi fêrbûm û baş dizanim.

Sala 1966'an, riya weten vebû û em çûne Hayestanê. Tenê birayeki min li Qamişliyê ma. Ez car caran dîçime ziyaretiya wi. Li Hayestanê mal û şıxul dane me. Pêşiyê mala me ji Rewanê dūr bû. Pışti karê Radyoya Rewanê em hatine gundê Abovyan, nêzikê bajarê Rewanê. Ji sala 1967'an heta sala 1985'an ez him di Beşa Kurdi him ji a Erebi da xebitim, paşê teqaût bûm.

*Kak Aram, dengbêji û sazbandiya te çawa destpê kir, kerema xwe ra ji me ra bêji?*

**A.TİGRAN:** Wexta min di mektebê da dixwend, di dersên muzikê da li nav şagirtan dengê min eyan bû ku hin baş û çêtir e. Ewili bi devpîfîkê (Armonika) va paşê akordiyon û piştra ji, ku heta iro domdikim, ez cumbûşê lêdixim. Berda ji dıstıram.

Di mala me da xalê min ûdê lêdixist. Bavê min helbest û bendan dınvısı. Lema dengbêji û sazbandiya min di nav malê da nebû problem, serda ji alikariya min dikirin. Dema ez gihiştim, bûm 25 salı dest bi dengbêjiyê kir. Di şayi û dewatên Kurd, Ereb û Ermenan da beşdar bûm û kılaman got. Stranan min hazır di-

kır, lê belê koma hevalan hebû û me dî şayiyan da tev dıgot. Pırani çarinên bavê xwe mın dıkir kılâm dıstıram. Bavê mın jı wı ali va gelek alıkariya mın kır û ez saya serê wı gıhıştıme vê rojê.

Dema ez gıhıştıme Hayestanê, dı dest mın da çend kılâmên hazır hebûn. Çûme Radyoya Rewanê-Beşa Kurdi, mın ewana jı wan ra xwend û stram. Lı xweşa wan çû û ewana mın qebûl kırın. Bı vi awayı dı sala 1967'an da ez bûme kulıxçiyê (karmendê) radyoyê. Bavê mın disa her dıwısi, dıda mın, mın jı mıqam dıfırând û dıxwend. Her usa helbestên Cigerxwin û şairên Yekitiya Sovyet ên Kurd jı mın dıkir kılâm.

Pışti teqâûtbûnê pêwendiyên mın tu caran jı hevalên Radyoya Rewanê qutnebû, her dom dıke. Heta quweta mın û dengê mın derkeve jı bo sazbandı û hunermendiya cımaetê ezê bıxebıtım.

*Tu bı xwe Kurd nini, lê wek dengbêj û hunermendeki Kurd tê nasın, seba vi kari tu çı dıkari jı me ra bêji? Çıma xasıma bı Kurdi dıstırêyi?*

A.TİGRAN: Bavê mın her car jı me ra dıgot: "Hûn tu caran xwe jı Kurdan veneqetınım, jı wana dûrnekevın. Gelek xêra wana gıhıştıye me. Serda pır qenciya Kurdan gıhıştıye Ermenan." Jı xwe bavê mın jı, dema qırkıma fillan jı aliyê roma reş bı Kurdi xeberdanê va xwe xılas kırıye, nehatiye kuştın. Bavê mın bı vê hezkırınê va bend û helbestên Kurdi dıwısi û xızmeta Kurdan dıkir. Çawa mın dı jor da jı got, em bı Kurdan va tev dıjiyan, şın-şayıyên me jı hev venedıqetiya. Vaye ev hemû sedeman gıhıştıme hev û ez bûme dengbêj û sazbandeki Kurd.

Ez çıqas bıxwazım jı, zıman û têla cumbûşa mın dıçe ser Kurmanciyê. Ez jı Kurmanciyê hezdıkım û pey riya bavê xwe dıçım. Jı kar û xebatên xwe pır memnûnım

*Qarabêtê Xaço û tu Ermen in lê Kurdi dıstırên. Xên jı we kesên dın jı henın ku bı Kurdi dengbêji an sazbandı bıkın? Ev dı nava gelê Ermen û Kurdan da çawa tê dıtın?*

A.TİGRAN: 2-3 kes disa Ermen henın ku dengbêji û sazbandiyê lı Beşa Kurdi dıkın. E-

wana jı jora xetê hatine Sûriyê û jı wıra jı hatine Ermenistanê.

Dı Yekitiya Sovyetan da kê bı çı zımani qısebike, bêje, bıstırê serbest e. Tu qeyd û bend lı pêşiyê nıne. Ev tışt jı bo nêzıkbûna gelan jı rolek baş dilize. Dı nav xelkê Kurd û Ermenan da jı her usa nabe meseleki nebaş. Jı ber ku dı nav me da tu ferqı tunne ye. Gel jı hunermendan loma nake. Ev bûyer jı dıvê fıkrên baş bıde hemû alemê.

*Kak Aram, tu dı televizyonê da jı kılaman dıbêji? Deng û awazên te xweşa Kurdên Yekitiya Sovyetan jı tê?*

A.TİGRAN: Ne bı zımanê Kurdi ne jı bı Ermeniki dı televizyonê da mın nestıra, yani ez tu car derneketıme televizyonê. Tenê dı radyoyê da Kurdi dıbêjim û dıstırê m.

Çawa hûn jı dızanın heftê carek guhdar jı Beşa Kurdi a Radyoya Rewanê kılâm dıxwazım ku bèn sıtırandım. Pırani jı kılâmên mın dıxwazım. Bı gotınêk dın gelên Ermenistanê deng û awazên mın hezdıkım.

*Kak Aram, stranên te bı nota ne an bê nota ne?*

A.TİGRAN: Pêşiyê mın xwast nota fêrbım, lê mın neqedand. Hemû kılaman bê nota dıbêjim. Helbet hêsan nıne. Kılâmên nû gava derdixinım, ewılı dı nav dıl û hışê xwe da wek nota rêzdıkım, dıstırê m, xasıma kılâmên Kurdi. Heke xweşa mın çû ez nav xelkê da eşkere dıkım, nehat hın lı ser dıxebıtım, heta bı rasti bıbe kılamek rınd. Bawer bıkın jı kılâmên bı nota hın çêtir dıbe û ez jı zûtırkê jı ber dıkım.

*Stranên te lı Ermenistanê wek pirtûk çapbûne? Kılâmên te paşê jı aliyê hunermendan hatiye wergerandın ser notayê an na?*

A.TİGRAN: Na, mina kıtêbek nehatiye weşandın. Lê dı Radyoya Rewanê lı Beşa Kurdi da ev tışt heye. Hım jı ewana bı zımanê Ermen û Rûski hatine tercıme kırın. Belê kılâmên mın goti, jı aliyê zanayên muzikê hatine notakırın. Ewana wek dewlemendiya gel dı arşivan da hatine parastın.

*Tu xebatên xwe ê sazbandiyê tenê an bı komeki ra pêktini?*

A.TİGRAN: Koma muzikvanên me heye. Lê belê pêşiyê helbestê ez bi xwe dibinim, dicerbinim paşê mîqam bo wi diafrinim, hazir û amade dikim. Evana hemû tava dikim û hinê komê dikim. Axiriyê em bi tevayî kîlamên teze dibêjin û distirên.

*Bi çî usûl û rê tu helbestan hildibêjêrî, an dibîni? Bi gotineke din çî didî ber çavan, difîkiri dema tu ji nav yêrî heya hildibêjêrî?*

A.TİGRAN: Pîrani li ser evîniya welat û hezkîrîmê ez kîlamên dibêjim. Kijan helbest bi vê naverokê va tîji be ez ji nav wana hildibêjêrîm û li ser dixebitîm. Helbestên bi wezn hatîne nîvisarê, hîn bi hêsani û baş kîlam jê der-tên, lema ez xasîma ji nav wan helbestan hildibêjêrîm.

*Te sazbandî û dengbêjiya Kurdi da deng û awazek nû anî. Bi peyvên xweş û bi şikleki nûjen tu distirêyî. Seba çî te ev yek pêwîst dit û bi kijan rê te ev yek pêkani?*

A.TİGRAN: Ev tev merifetê bavê min in. Gava helbestên xweş dinvîsi dida min, min jî, ji wana kîlamên bedew û baş difîrand. Helbet ew merifet û qebîliyet jî li cem min hebû. Ez li ser helbest û çarînan gelek difîkîrîm, wana pîr çaran dicerbinim. Carna bi mehan li ser wana dixebitîm. Heke tîştêk baş were ortê, wi çaxî ez eşkere dikim, têla cumbûşê dixim û distirêm.

*Kak Aram, tu kijan dengbêj û sazbandê Kurd hezdîki? Û tesîra tu kesên sazband û dengbêjên Kurd ên nû û ên qedim li ser te hene an na?*

Li Sûriyê berê min nêzîkî mîqam û usûla min hîn kes hebûn, dîsdiryan û sazê dixistim. Ewana ser min tesîrê kirin. Lê ne wek tema-mî. Ev çend sal in ku çawa hûn jî dibîhîzin di hunermendî û sazbandîya Kurdi da rêyek teze min afirand. Tu tîşt ji xwe berê dernakeve ortê, her tîşt li ser koka xwe hêşîn dibê. Ez jî dengê Hesên Cîzrewî hezdîkîm.

*Te li Ermenistanê qurs an xwendîna muzîkê dit?*

A.TİGRAN: Na xêr. Min ne xwend ne jî çûme qursê. Çawa min li jor got ewilî pêşni-

yari min kirin, lê belê gelek zehmet bû, hîn êdî ez ne ewqas xort bûm, aliyê din min jî xwe ra rê û usûl di nava pratîkê da hîlbijartibû. Min nedîkari jî wê saetê şûnda bixwinim û jî xwe ra rêke din peyda bikim an usûla xwe big-hurînim.

*Bernameyên xwe hûn li gora Kurdên Yekî-tîya Sovyetistanê an seranserî Kurdistanê hazir dikin?*

A.TİGRAN: Ez, her usa jî bername berna-meçêkirên Radyoya Rewanê gora Kurdistan û dinyayê bernameyê xwe hazir dikim. Huner û sazbandî jî wek dewlemendiyên din, dewle-mendiya hemû insanîyetê ne. Rê û olaxên we-ha baş û rast vê babetê da hatiye hîlbijartin. Ji ber vê yekê xasîma jî bo Kurdên aliyê me rad-yo û televîzyon nine, jî bo seranserî cihanê ye, helbet anegorî quweta wê istasyonê ye.

*Bernameçêkirên Radyoyê bi çî usûlê ber-name hazir dikin?*

A.TİGRAN: Ez bi temami nîzanîm lê pîra-nî bi merkezi tîrî çêkirin. Gora rewşa wan ro-jan û pêwîstiyên xelkê jî her usa didim ber çav-an û programên xwe amade dikim.

*Bi ditîna te îro huner û sazbandîya Kurdan di kijan merhelê da ne? Gelo çî karên grîng pêwîst e ku em bigihîjne hunermendîya zema-nê?*

A.TİGRAN: Em dikarin bêjin sazbandî û hunermendîya Kurdi gora mîletên din li ortê ye. Ne gelek paş ne jî gîhiştîye tanga muzîk û hunermendîya gelên din. Gerek cilê (şitl) teze derkevîn jî yêrî kevn derbasbîn, hîn berhemên baştir biafrînin. Ez bêjim, ez bi nota nukarîm bêjim, bistirêm, jîbo dengbêjiyê dengxweş-bûn, rînd lîxistim ne bes e. Lê ewên nûgîhiştî divê evê yekê pêkbinin, bigihîjne muzîkvanên zemanî.

*Ji bona Kurdan bi taybetî mekteba muzîkê li wîra heye?*

A.TİGRAN: Li Hayestanê jî bo Ermenan hene lê jî bo Kurdan heye an na, vê gavê nayê bira min. Lê di mekteban da jî şagîrtên bi merifet ra alîkari tîrî kirin, meyla wana li ser kijan şaxê huneriyê be dîşînine wan mekteban, ali-

## DILO MENAL

*Dilo menal xweş bihar e  
Quling dîkîn zare zare  
Dibê m rabîn temaşê kîn  
Kurdîstana we birindar e.*

*Dilo menal bihar şîne  
Ev dilê me kul-bîrîn e  
Hele tu jî felekê pîrske  
Jî Kurda ra çî xayîn e.*

*Dilo menal xweş havîn e  
Quling dîkîr qîr-qîrîn e  
Dibê m rabîn temaşê kîn  
Ev dînya we derewîn e.*



kariyeke xurt dîdîm ku pêşta biçîm. Jî kîjan mîleti be bîla bîbe alîkari tê kîrîn.

*Şwan Perwer jî bo festivala ciwanan ya navnetewî hate Moskovayê. Îro jî tu bî vewandîna KOMKAR'ê hati vîra. Lî nav karîker, xwendevan û mîhacîrên Kurd tevî Newrozê dîbî. Te alîkariyek xurt a navnetewî da me. Bîratiya gelê Ermen û Kurdan ê dîroki hîn geş kîr. Jî bo bîratiya gelan û sazbandî û hunermendîyê ev çûyîn-hatîna hunermendan rolek çawa dîleyze?*

**A.TİGRAN:** Bî rasti evana tîştên baş in û lazîm e. Bîrati û hezkîrîna mîletan her pêşda dîbe. Dî nav gelan da mîhebatîyê tîne holê. Muzîk û sazbandî dewlemendîyên hemû cihanê ne, lazîm e dîsa pêşkêşî mîlet bîbe. Lî alîyê dîm muzîk, ruhiyeta insanan qewî dîke, merîvan bî jîyan û têkoşînê va grêdîde. Em dîkîrîm bêjîm dî zemanê me da pêwîstîyek e.

*Pirtûk û rojnameyên Kurdî ên lî dervayî welat dertên, tîn dîgîhîjîm destê te? Heta nuha te navê KOMKAR, rojnama wî DENGÊ KOMKAR bîhistûbû, dîtûbû?*

**A.TİGRAN:** Mîm navê KOMKAR bîhistûbû û Dengê Komkar jî gîhîştûbû destê mîm. Ez bî tîpê latîni kê mî dîkarîm bîxwînim.

*Heke kîlamê te bî taybetî lî ser bîratiya Kurd û Ermenan hebîn, jî kerema xwe ra yekî bîdî me em çapbîkîn.*

**A.TİGRAN:** Ez gelek cejn û şayîyan bî Kurdî dîstîrêm. Gava dî nav guhdaran da Ermen jî hebîn wî lexzê ewê kîlamê bî Ermenkî jî dîstîrêm û hemû guhdar tev tî dîgîhîjîm ku ez çî dîbêjîm. Lema bî hevra kêfxweş dîbîn. Jî bo bîratiya wana dîxebîtîm. Bî dîtîna mîm ê rasti jî ev e.

*Dî Ermenîstanê da Newroz lî nav Kurdan tî pîroz kîrîn? Wek vîra cîvîn û şayîyên mezin çêdîbîn?*

**A.TİGRAN:** Belê, lî ba me Kurd tev cînarên Ermen eyda Newroza pîroz dîkîm. Hîm jî şayîyên gelek mezin saz dîkîm. Tev edetên xwe dîparêzîn û hîm dewlemendîr dîkîm.

*Gotînek te xên jî pîrsîyarên me heye keremke bêje.*

**A.TİGRAN:** Jî hevalên rêvebîrîna KOMKAR'ê û hemû hevalan ra pîr sîpas dîkîm û serketînê dîxwazîm. Ez gelek kêfxweşîm ku tevî Newrozê bûm. Hîndîk be jî alîkariya we mîn kîr. Ez umîd dîkîm ku hîn gelek caran emê hev bîbînn. Tîşte mîn heye dîsa umîd heye ku dî duwerojê da ezê kîlamên xwe bîkîm muzîka rojane. Bî gotînek dîm wek muzîkê rock ku berpîrsîyarên Radyoya Rewanê jî mîm daxwaz kîrîne. Car dîm saxî û sîlametîya we dîxwazîm. Her bîrati û hevaltîya mîletan dîxwazîm.



## ZAROK

# KARIYÊN KEÇIKA BIÇÛK

TOLSTOY



Du keçikên biçûk ji berhevkirina kariya vedigeriyan. Zembilên xwe miş dagirtibûn. Lî ser riya wan hesinrêyek hebû. Dîviyabû dî ser wê ra derbasbûna aliyê dîn.

Jî wan wetri (wan welê dîzanibûn ku) trêna jî wan gelekî dûr e. Xwestin ku dî ser riya trêna ra derbas bin. Nişkava dengê lokomotifê hate wan. Keçika mezin zû paşda vegeriya. Lê ya biçûk lî ser hesinrê bû. Berbî aliyê dîn dilezand û dîçû. Xwişka mezin jêra got: "Paşda venegere êdî, derbasbe!" Lokomotif pîr nêzik hatibû êdî. Wîsa zehf deng derdixist ku keçika biçûk jî ber wî dengê bilind, gotinên xwişka mezin qet nedibihist. Wê wîsa fehm dîkir ku xwişka mezin dibêje "paşda vegere". Lema wê jî kîr ku paşda vegere. Vegeriya hindik mabû bibore lê piyê wê lî hesin asê bû û hilteplî. Kariyên wê jî zembilê rîjiyan û belavbûn. Çî bike keçika belengaz? Destpê kîr ku yeko yeko kariyan berhev bike û têxe zembilê.

Hingê êdî lokomotif jî pîr nêzik bûye. Makinist lî ser hev lî dudukê xîstîye.

Xwişka mezin:

"Dest jî kariyan berde!" qijiyaye.

Lê keçika biçûk welê fehm kîriye ku ew dibêje kariyan baş berhev bike, lî erdê nehêle. Makinist nekariye trêna bîsekînine. Tenê lî dudukê xîstîye. Çî jî desta tê. Trêna bî wê leza xwe dî ser keçikê ra derbasbûye çûye.

Xwişka wê bî hawar qêrin gîriyaye.

Rêwiyan trêna serên xwe dî pencerê ra derxistîne û nihêrine ka gelo lî derva çî qewimî.

Polêsê Trêna çûye ku lî paşîya vagona here dawiyê binhêre, ka çî bî keçikê hat.

Dema trêna derbasbû çavê rêwiyan hemû lî paşiyê bûye. Gîşkan ditne ku keçik dî navbera herdu riyan hesin da serdevkî dirêjkîrî bûye, xwe qet nelîvandiye.

Lê piştî ku trêna derbasbûye çûye, çî bûye hûn dîzanî? Serê xwe bilind kîriye wê keçika biçûk. Rabûye dîsa kariyên xwe berhev kîriye û paşê çûye cem xwişka xwe.

## DENDIKA ERÛGÊ

Dayikê ji zarokan ra erûg kiribû. Wê bî şivê ra ew bîda zarokan. Gîşt xîste tebaxeki.

Vanya dîçû dîhat erûgên lî ser masê bihn dîkîr. Heta wê rojê qet erûk nexwaribû. kêfa wi gelekî bî erûkan ra hatibû. Lî dora tebaxê dîzvîri. Dîlê wi gelekî dîçû erûkan !

Carekê lî odê tukes nemabû. Wi ji xwe negirt hema çû libek hîlda û avête devê xwe. Dî carekê da ew daqurtand.

Berî ku şivê bîxwîn, dayikê erûg jî martî û dît ku yek ji wan kême. Jî bavê ra ev yeka han got.

Lî ser sîfrê bavê wan pîrsî:

– Geli zarokan kesî jî we erûg xwarî jî vê tebaxa han?

Hemûyan bî hevra gotî:

– Naaa

Herçend Vanya jî şerma sor bûbû, wek tivreki sor, lê wi jî wek yê dîm got:

– Naa, mî nexwariye.

Hîngê bavê wan got:

– Lî mî bînhêrî geli zarokan: eger we xwaribe, we ne baş kirîye. Lê tîştê xîrabtî ew e ku, dî nav erûkê da dendîkeke bîçûk heye. Kesên ku nîzayî erûg çawa tê xwarî, dendîkê jî da-duqurtînin. Lê roja dîm dîmrî. Tîrsa mî jî vê yekê ye.

Vanya sîpîçûlki bû, rengê wi çû û got:

– Naa mî dendîk nexwar, dî pencerê ra avêt.

## Pê Dîzani?

Jî vana kijan zûtîr dîbeze?  
Lî gor beza wan, navê wana  
lî dû hev rêz bike:

Mîrov  
Fîl  
Mar  
Çûkdeve  
Kêvrûşk

- 1 .....
- 2 .....
- 3 .....
- 4 .....
- 5 .....



BEKSIY:  
Çûkdeve  
Kêvrûşk  
Fîl  
Mîrov  
Mar




## CİGERXWÎN

### TARÎXA KURDISTAN 2

Cildê duwemin yê "TARÎXA KURDISTAN" a mamosta CİGERXWÎN ji derket. Cildê wê yê pêşin ji di sala 1985'an da di nav Weşanên ROJA NÛ da derketibû.

Mamosta Cigerxwin di vê beşa pirtûka xwe da behsa dewlet, femandari û eşirên Kurdistanê yê dewra Îslamiyetê dike. Ew tarixa Kurdistanê ji dewra Ebbasiyan dîgre û hetani Femandariya Erdelanê tine. Gelek agahdariyên kêrhati dide ku iro ji kê m kurd hene pê dîzanin. Ji ber ku tarixzanên ereban bi xwe li ser kurdan û li ser pêwendiyên kurdan û Îslamiyetê pûr nwisine û mamosta Cigerxwin ji — ku zimanê erebi û tarixa ereban baş dîzanibû, karibûye ku li ser tarixa gel û welatê xwe binwîse... Dema mirov vê xebatê di destê xwe da û li ber çavan dibîne, mirov careke din bi hurmet Cigerxwin bi bir tine.



KEMAL BURKAY

## özgürlük ve yaşam



ŞIIRLER

KEMAL BURKAY

## azadi û jiyan



SIER

Berevoka helbestan ya KEMAL BÛRKAY di nav Weşanên Roja Nû da derket. Têda hin helbestên pirtûka "Prangalar" (1967) û nêzi temamiya helbestên pirtûka "Dersim" (1975) cih girtine.

Nwîskar bi xwe ev helbestên xwe ji turki wergerandiye kurdi. Kurdi û turkiya wan bi hevra hatine çapkirin.

## melayê ciziri



**DÎWAN**



## MELAYÊ CIZIRÎ DÎWAN

Cara Pêşin e ku temamiya "DÎWANA MELAYÊ CIZIRÎ" bi tipên latini hat çapkirin. Ev klasika kurdi ya giranbîha heta niha gelek caran tenê bi tipên erebi hatiye çapkirin— xên ji çend beşên wê ku di hin kovar û rojnameyan da hatine weşandin.

Di tarixa edebiyata kurdi da ciheki MELAYÊ CIZIRÎ ê taybeti heye. Esera wi "DÎWAN" bi sedsalan li Kurdistanê di medresên dini da hatiye xwendin û iro ji li Kurdistanê wek esereke kurdi

ya kevn gelekî bi rûmet e. Lê ji ber ku bi tipên erebi ye kêma kes dikarin wê bixwinin. Ji ber vê yekê Weşanên ROJA NÛ hewce dit ku wê bi tipên nû bigihîne destê xwendevanan. Bi nusxeyê latini ra tevayî nusxeyê erebi ji hatiye çapkirin.

Transkribekirina (wergirandina tipan) Diwanê ji aliyê Zeynelabidin KAYA û M. Emin NAROZÎ hatiye çêkirin. Ji bo ku xwendevan bikaribin bi hêsani şî'iran fam bikin, wan jêra ferhengokek ji amade kirine.

Bi "Diwanê" ve tevayî, heta niha çar eserên kurdi yê klasîkî di nav Weşanên Roja Nû da derketin.

## "ŞÎN Û ŞADÎ" Û "DILISTAN" — SEBRÎ BOTANÎ

"ŞÎN Û ŞADÎ" Û "DILISTAN" du pirtûkên helbestan yê Sebrî BOTANÎ ne. Ev herdu pirtûk berê bi tipên erebi hatine weşandin. Lê vê carê ew bi destê Serbest ZAXOYÎ li Stockholmê hatine transkribekirin û di berevokeki da hatine çapkirin.

LI BERLINA ROJAVA NEŞRÎYATA  
KURDÎ SALEK QEDAND KETE SALA  
DUWEMÎN

Sala 1987'an ji meha Adarê virda heya iro, heftiyê carek di "Radiyo 100'i" da pêşiyê 15 deqge, niha niv saet em neşriyeta Kurdi dikin. Em di bernamên xwe da bi kurtî li ser pirsên jêrin disekinin û gelê Elman û karkerên Kurd li ser xebatên xwe agahdar dikin:

1— Li ser pirsgrêkên malbatê karkerên Kurd yê aborî, civakî û hwd. disekinin.

2— Dirok, ziman, çand, edeb û folklorê Kurdi bi gelê Elman û biyanîyên din didin nasîn û bihistin.

3— Zilm û zordariya li ser gelê me dibe, tîne eşkere kirin.

4— Nûçeyên welat û cihanê yê rojane ji tîne belavkirin.

Wek tîne zanin di nav kar û xebatên me yê li vir, ders bi zimanê dayikê bo zarokên Kurd, di radiyo û televizyonê da neşriyeta Kurdi bo kar û barên civakî dairên şewrandin bo karkerên Kurd werin vekirin, ji bo destxistina van mafan em bê westan dixebitin. Em baş dîzanin ku ev xebata me badilhewa naçe û neçû ji. Hin ji niha va li çend bajarên E.Federal û li Berlina Rojava ev xebatana cihê xwe ditin. Lê em evê ji baş dîzanin ku gelê me bi van xebatan xilaz nabe, lê belê di jiyana tînekoşinê da cihê van xebatan ji heye û badilhewa nine. Îro ji duhê pirtir gelên cihanê haj mesela Kurd û Kurdistanê ne. Wê roj bê emê di wela-tê xwe yê azad da radiyo û televizyonê da weşanên xwe bikin. Hemû niştimanperwerên Kurd dikarin ji redaksiyona Bernama Kurdi ra deng-behs û nûçeyan bi rêkin.

NAVNIŞANA BERNAMA KURDÎ:  
Radiyo 100 Bernama Kurdi  
Potsdamerstr. 131  
1000 Berlin 30

Bi silavên dostî û brati. Redaksiyona Bernama Kurdi — B.ROJAVA